berhevkar

**Zeynelabidîn Zinar**

# MÎRATE

Leyztikên Kurdî



Institut kurde de Paris

**PENCÎNAR**

**Stockholm 1994**

Institut kurde de Paris

K.L. 2025

Qezenca vê pirtûka min ji Komika Ehmedê Xanî re ye.

Diyarî bo Enstîtuya kurdî
ya parîsê.
Bi xweşî û şadî...
1/1/1998
Zeynelabidîn Zinar

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

LIV.KL. 2025
23/11/2017
914 ZIN MIR

berhevkar

Zeynelabidîn ZINAR

INSTITUT KURDE DE PARIS · BIBLIOTHÈQUE

# MÎRATE

Institut kurde de Paris

INSTITUT KURDE DE PARIS · BIBLIOTHÈQUE

*leyztikên kurdî*

Pencînar
Weşanxaneya Çanda Kurdî
Stockholm 1994

**Mîrate**
Leyztikên Kurdî
Çileyê Pêşî 1994
Box 3088
161 03 Bromma, Stockholm-Sverige

Institut kurde de Paris

© **Pencînar**

Wênevan: Kemal Heyran

Devera çapê : Şam - Sûriye

**ISBN 91 972090 5 8**

**"Gelî Kurdan!**
**Eger hûn naxwazin ji hev taromaro û winda bibin, berî her tiştî zimanê xwe bixwînin û bidin xwendin.**
**Lê eger dixwazin xwe nas bikin û xwe bidin naskirin û hezkirin, û rûmet û bi rûmet û serbilindî bijîn, dîsa zimanê xwe bixwînin û bidin xwendin."**

(Dr. Nûredîn Zaza)

Institut kurde de Paris

**Şadî bo giyana xaziyê doza netewî Mele Ehmedê Xasî...**

Institut kurde de Paris

# Çend Gotin

Sedemê ku min navê vê pirtûka *Leyztikên Kurdî* daniye **Mîrate**, ev e ku ji hezaran sal berî niha ve ye, ew tiştên ji çanda kurdî ya dewlemend mixabin ku îro li bakûrê Kurdistanê ber bi wendabûnê ve diçin, ha mistek jê hatine berhevkirin û ketin nivîsê. Belam ew gencîneyên kurdî ji 1924-an ve, tev bi carekê ji aliyê dewleta Tirk ve hatine qedexekirin û tu fersend jî nedane ku Kurd li wan xwedî derkevin.

Îcar di van heftê salên bihurî de her ku çûye, hin bi hin Kurd ji wan tiştan dûr ketine û di şûnê de tiştên tirkî pê dane fêrkirin, herweha bi gotina *"ez Tirk im, bavê min Tirk e..."* jî, xwestine ku ew zû ji cibiliyeta kurdî, kesayetiya wê û ji bingeha asasê xwe averê bibin.

Erê, çendî ku dijmin ew rûreşiyên mezin li pêşberî mirovatiyê û dekên ku li demokratiyê kirine jî, lê dewlemendtiya çanda kurdî digel saxlemtiya nijada neteweyî her li gora destdayînên xwe û di binê wê koletiyê de heta ku jê hatiye jî fersend û havil nedane wan kiryarên kirêt û her singa xwe li pêşiyê kirine çeper, dest bi parastina xwe kirine. Kurd her xwedî li wan tiştên xwe derketine û bi toreya xwe lipikîne; ji zarûkan bigir hetanî dayikan, zilam û kal digel xort û keçên dilovan tev, bi zimanê netewî peyivîne û digel çanda xwe ya şên jiyane.

Lê belê piştî 1981-ê, rewşa bakûrê Kurdistanê bi hawayekî "modern" hate guhartin; bi riya televizyon û kasetên video yên asîmîlasyonê digel rojname û dibistanên biyanî, her ku çû tîna xwe bêtir li nifşa nûhatî kiriye û pêbipê ew ji ziman û toreya kurdî averê kirine. Êdî rewşeke welê çêbûye ku niha li gundan, li taxên bajaran piraniya kesên gênc zêdetir bi zimanê biyanî yan têkelê bi kurdî dipeyivin û zimanê bab û bapîran diterikînin. Û li şûna wan tiştên kurdayetî, tiştên biyanî êdî dest pê kirine û xwe bi cih dikin.

Institut kurde de Paris

Îro pêlek ji ya asîmîlasyonê ku herî balkêş e jî ev e: Piştî ku elektirîk çûye gundan, îcar Parastina Tirkiyê bi hêsanî dest bi reşandina tovê zîwanê kir û li nava zeviyên genimê sor reşand; bi riya çerçiyan filîmên vîdeo li gundan digerînin û bi heftiyekê bi heft hêkan didin kirê. Lê "çerçî" mehekê bi ser filîmên xwe ve nayên. Dema ku tên jî, îcar filîmekî din bi xwe re tînin û bi kirya heft hêkan didine gundiyan. Ha wisan ew tovê jehriyê bi mehan û bi salan di nava xelkê me de dimîne. Îcar ji ber van sqûmatên giran e ku min pêwîstiya nivîsandina van leyztikên kurdî li ser xwe wacib dîtin û di 1985-an de dest bi berhevkirina wan kiribû.

Hinek ji van leyztikan, hêj ji zarûktiyê ve li bîra min mabûn û hinek jî min ji nava xelkê berev kirine. Lê mixabin fersenda çapkirina wan ta niha jî bo min çênedibû.

Erê, çendî ku ez dibêjin ev *Leyztikên Kurdî* ne, lê di rastiya xwe de leyztikên herêmeke Kurdistanê ne. Ji ber ku texlîtên Leyztikên Kurdî, bi hezar û hezaran hene. Lê evên di *Mîrateyê* de, hinek ji leyztikên herêma Reşkotan, Bişêrî û Xerzan in ku hatine nivîsandin.

Di nava Leyztikên Kurdî de gelek texlîtên ecêb jî hene ku nivîsandina wan hinekî sik tê dîtin. Yek ji wan "Leyztika Kîrpoçê" ye ku di nava şerîdên berhevokên min de hatiye dîtin. Texlîtekî mîna vê leyztikê, di mîtolojiya Yûnaniyan de jî heye. Bi kurtî weha ye: *Du zilam organên xwe yê cinsî radikin û serê wan didine hev, zorî din hevdûdu, heta ku yek zora yekî dibe.*

Pirtûka Mîrate li ser du beşan hatiye avakirin.

1- Di beşa *Leyztikên Zarûkan* de, 32 cûre hene.

2- Di beşa *Leyztikên Mezinan* de, 15 cûre hene.

Ji hinekên van leyztikan re hinek wêne jî hatine çêkirin. Birayê hêja Kemal Heyran bi firçeya xwe rengûrûyê nijada kurdî li wan eşkere kiriye û di wan de toreya nijadî aniye ber çavan.

Bi umîda ku ev pirtûk dê hinekî ji leyztikvanan re bibe alîkar û pê tore, livak û tevgera kurdî careke din li bîra wan bêtin û li Pirtûkxana Kurdistanê jî pîrozbahiya xwe dubare bike...

**1994 08 13**

**Zeynelabidîn Zinar**

Institut kurde de Paris

# LEYZTIKÊN ZARÛKAN

## BEŞ - I

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

BIBLIOTHÈQUE PARIS

Institut Kurde de Paris

# HEFTOK

Navê vê leyztikê çendî ku *Heftok* e, lê bi pênc kevirokên grover ên weke xaran tê leyîztin.

Ev leyztik, xasmetî ya keçikan e. Didu û zêdetir keç dikarin bi dorê bileyzin.

Yek, tiliya eşedê ya destê çepê û ya beranî fireh vedike, destê xwe mîna pirekê qewz dıke û serê tılıyan datîne erdê, ranake hetanî dawiya leyztikê tê.

Her pênc kevirok di destê rastê de ne. Meriv yek ji wan kevirokan hildifirîne hewa û her çarên din berdide erdê. Kevirê li hewa berî ku bikev erdê digire û hetanî dawî tê de dimîne.

Leyztika Heftokê



institut kurde

Piştre kvirokê di destê rastê de hildifirîne hewa, berî ku kevir berjêr bibe, destê rastê li yek ji her çar kevirokên li erd dixe û ew di binê destê xwe yê qewzkirî (pirê) re derbasî aliyê din dike û her wî destî dîsan zû dide binê kevirokê ku li hewa ye, ew li hewa digire. Bi wî hawayî didomîne heta ku her çar kevirokên li erdê di binê pirê re derbas dike.

Eger ew kevirokên li erdê yeko-yeko di binê pirê re derbas nebin, yan eger li hevûdu bikevin, yan jî ew kevirokê ku dihilavêje hewa bikeve erdê, leyztikê wenda dike.

Piştî ku her çar kevirok di binê pirê re derbas bûn, destê ku qewz kiriye radike û her pênc kevirokan dixe nava kefa destê rastê, yekî ji wan hildifirîne hewa û her çarên din datîne erdê, pêre pêre jî wî kevirokê li hewa, berî ku bikeve erdê digire. Piştre dîsan ew wî kevirokê di destê xwe de hildifirîne hewa û bi eynî destî her çar kevirokên li erdê berhev dike û dixe nava kefa destê xwe û kevirokê li hewa berî ku bikeve erdê, bi wî destê ku çar kevirok tê de ne digrie.

Eger leyztik bi vî hawayî bê şaşî giha virê, xwediya leyztikê qezenc dike û dora leyztikê dibe ya hevaleka din.

Institut kurde de Paris

# ÇAVGIRTÎK

Bi vê leyztikê, zarûkên ku temenê wan di navbera şeş û pazdeh salan de be dileyizin û sînor ji jimara wan re tune.

Zarûk li navrastekê yan jî di xaniyekî fireh de kom dibin. Çavên yeki/ê tê grêdan û yên din jî li hawîdorê ya/ê çavgitî diçin û tên, tep (dest) lê dixin û stıran û dilokên curbicur dibêjin.

Zarûka çavgrêdayî pir li xwe haydar e. Kîjan zarûk gava tep lê bixe, ew jî kiçîmê wê dike. Eger bigire, îcar çavên xwe vedike û çavên wê zarûkê girêdide. Leyztik her wisan didomîne.

Çi dema ev zarûka duyemîn jî yekê bigre, çavên xwe vedike û çavên wêya ku hatiye girtin girêdide.

Lê pir caran zarûka ku pêşî çavên wê têne grêdan, wisan grêdayî dimîne heta ku dawî li leyztikê tê.

Institut kurde de Paris

# BERDE-BERDE

Ev leyztika *Berde-Berde* bi du zarûkan û zêdetir tê çêkirin.

Zarûkek li erdê rûdine û pahniya nigekî xwe datîne ser pêçiyên nigê din. Herdu destên xwe ji hev vedizelîne û dike mîna bihost. Tiliya qilîçê ya destekî datîne ser pêçiyên nigê li jorê û tiliya qilîçê ya destê din jî datîne ser tiliya beranî ya destê ku li ser nig e. Bi wî awayî herdu nig û herdu dest li ser hevûdu tîk bilind dimînin.

Zarûkeke din li ber wê zarûkê disekine, herdu nigên xwe dike cot û xwe di ser milên wê re hildiqevêze aliyê din, disa ji wî alî xwe hildiqevêze vî alî. Eger di hilqevaztinê de dereke wê li dest û milên zarûka rûniştî bikeve, vêca ew rûdine dest û nigên xwe her wisan datîne ser hevûdu. Îcar zarûka ku berê rûniştî bû, radibe xwe di ser nig û destên wê re hildiqevêze.

Eger devereka vê zarûkê li zarûka rûniştî bikeve, îcar ew rûdine, ya rûniştî radibe û xwe di ser wê re hildiqevêze. Eger devereka vê lê neket, piştre zarûkên din bi dorê xwe di ser milên ya rûniştî re hildiqevêzin. Leyztik wisan didomîne, heta ku zarûkek lê bikeve û di şûna wê de rûne, yan jî ew her wisan rûniştî dimîne.

Institut kurde de Paris

# JIJÛ

Ev leyztik, ji bo şadkirina zarûkên piçûk tê çêkirin. Merivekî mezin, li devereke tenha carcîmekê yan betanîye, perde û gwd. li xwe dilefîne, wisan ku deverek ji laşê wî neyê dîtin û zarûk nizanibin ku kî ye. Piştre ew li ser çok û enîşkên xwe, bi çaplûkan diçe, dikeve xaniyê ku zarûk li wir in. Herdu milên xwe di binê carcîmê de bi pêş ve dirêj dike û serê tiliyên herdu destên xwe bilind dike û berjêr dike, di nava zarûkan de diçe û tê, her carê qasekî jî xwe gijê wan dike.



Institut kurde de Paris



Leyztika Jijû

Institut kurde de Paris



# MOZA DEWARAN

Zarûk xasma yên kur, ji malan dûr diçin, li deverekê dicivin û yekê ji xwe dikin *gavan*, ên din xwe dikin mîna *dewar*an (garan), hinek jî xwe dikin mîna *moz*an.

Zarûkên ku xwe kirine moz dema êrîşê dibine ser garanê, zarûkên ku xwe kirine dewar jî tev bi hevûdu re dikin borebor û ji ber mozan direvin, ber bi malan ve diçin û xwe di hinduruyan de vedişêrin.

Gava bi tena serê xwe li çolê dimîne. Piştre ew jî radibe, darê xwe datîne ser milekî, tûrikê nan davêje milê din û diçe gund, bi du-sê hevalan ve li nava malan digerin û ji xwe re tiştên xwarinê berhev dikin. Piştî berhevkirina tiştan, zarûk hemû bi hev re diçin geştê, li ser kaniyekê xwarin çêdikin û dixwin.

Institut kurde de Paris

# SIWAR-SIWAR

Çend zarûk dibin du ber. Jimara herdu beran mîna hev çêdibe. Her berek di nava xwe de yekê hildibijêre û dike *serok*.

Serokê herdu beran di nav xwe de pişk dikin. Kîjanê kar bike, her hevalekî bera wî, li hevalekî ji bera din siwar dibe û li nava malan digerin.

Ew, ji devera ku siwar bûne, rast diçin li ber deriyê malekê disekinin û serokê siwaran gazî wê malê dike, dibêje:
- Malê, malê! Siwar siwar? Yan peya siwar?

Çaxê ew deng diçe xwediyê/a malê, jixwe ew dizane ku leyztika zarûkan e, ji hindurû dernakeve derva û bi deng bersîv dide:
- Siwar bi siwariya xwe! (Yan jî:) Peya-siwar!

Eger xwediyê/a malê bêje: "Siwar bi siwariya xwe", yên siwar dîsa siwar dimînin û ji wê malê diçin maleke din û dîsa eynî wê pirsê dipirsin. Lê eger xwediyê/a malê bêje: "Peya-siwar", zarûkên siwar peya dibin û yên din li wan siwar dibin, ji wir diçin maleke din û her wê pirsê dipirsin.
Leyztik bi wî awayî didomîne...

Institut kurde de Paris

# TILÎPINDIK

Bi vê leyztikê, piranî zarûkên di navbera 4 û 10 salan de dileyizin. Zarûk di xaniyekî de kom dibin. Yekî mezin çavên zarûkekê girêdide û zarûkên din tev li hawîdor diçin û tên, tiliya xwe didin pinda wê û dibêjin: *Tiliya min û vê pindê...*

Kîjan zarûk çaxê tiliya xwe dide pinda ya çavgrêdayî, ewa çavgirêdayî jî xwe diheliqînê, da wê bigre. Dema yekê girt, çavên wê têne vekirin û çavên ya girtî têne girêdan.

Leyztik her bi wî awayî tê domandin...

Institut kurde de Paris

# MAK

Ji vê leyztikê re çewa *Mak* tê gotin, li hin deveran *Dê* û *Dêk* jî têne gotin. Lê li bipiranîya herêmên Kurdistanê her *Mak* tê gotin.

Bi vê leyztikê, keçikên ku temenê wan xasma di navbera şeş û pazdeh salan de be, dileyizin.

Devera leyztikê: Hinduriyekî fireh e, kutekek (stûn) tê de heye. Navê wê kuteka ku ji leyztikê re dibe hoçk *mak* e.

Keçik, pêşî di nav xwe de pişk dikin û yek dibe *gavanê makê*. Destekî gavan bi makê ve ye, hîç jê bernade û timî li hawîdorê wê dizivire. Keçikên din jî, tev li hawîdorê gavan diçin û tên, hem jî kilam û dîlok dibêjin û jê re çepik lê dixin. Ew, çi gava firseta xwe dibînin, ji nedî ve destên xwe li *mak*ê dixin. Lê gavan nahêle û bi nigê xwe li wan dixe. Eger nigê gavan li kîjanê bikeve, ewa niglêketî dibe gavan û bi makê digire. Lê belê tev li xwe haydar dimînin ku nigê gavan li wan nekeve.

Leyztik her wisan didomîne...

Institut kurde de Paris

# KERIK

Bi vê leyztikê çendî ku zarûk û xortik dileyizin, lê hin caran zilamên mezin jî pê dileyizin. Devera ku leyztik lê tê kirin meydaneke rast, an bênder e.

Zarûk, ji bo destpêkirina leyztikê di nav xwe de pişk dikin. Îcar kê ji wan bibe qar, pêşî ew xwe ditewîte; herdu destên xwe datîne ser çokên xwe û serê xwe berjêr dike. Zarûkên din yeko-yeko ji dûr ve bi bez tên û xwe di ser piştê re hildiqevêzin. Yê ku xwe hilqevazt, bi qederê sê-çar gavan jê dûr, ew jî her wisan xwe ditewîne. Îcar yekî din bi bez tê, xwe di ser pişta yê berê û pişta viyê duyemîn re hildiqevêze û li kêleka wan xwe ditewîn...


Bi vî hawyî, çiqas zarûk hebin tev xwe di ser pişta yên tewandî re hildiqevêzin û li dawiyê, li kêleka wan xwe ditewînin...

Çaxê dawî li kesên ku xwe hildiqevêzin hat, îcar ewê ku berê xwe tewandibû radibe, ji yê tewandiyê li kêleka xwe dest pê dike û xwe di ser pişta wan tevan re yeko yeko hildiqevêze û li pişt yê herî li dawiyê xwe ditewîne. Piştî wî, îcar yê duyemîn ku li kêlekê tewandî bû, xwe di ser pişta tevan re hildiqevêze û diçe xwe li dawîyê ditewîne. Leyztik her wisan didomîne. Eger zarûk pir bin, carinan dûvik bi sedmetreyan dirêj dibe.

Institut kurde de Paris



Leyztika Kerik



Institut Kurde de Paris

Di wê demê de şivan pezê xwe dibe nêzî gur û li wir dixe mexel. Hingê gur weha ji şivên dipirse:
- Tu çi dixwî?

Şivan bersîv dide:
- Simbil û sîr!

Gur dipirse:
- Tu çi dirrî?

Şivan bersîv dide:
- Mişkul û şîr!

Wê hingê gur dixwaze ku fêr bibe ka ew desmala ku hatiye veşartin bi kîjan zarûkê re ye û vê carê weha dipirse:
- Daweta kîjan zeriyê?

Çewa ku me li pêşî gotiye, şivan li her pezeka xwe navek danîye. Lê gur bi wan navan nizane û ne jî dizane ku desmal bi kîjanê re hatiye veşartin. Îcar çaxê gur dipirse *daweta kîjan zeriyê?* hingê şivan navê zarûkekê dibêje ku ango desmal pê re ye û gur dixapîne. (Mesela) dibêje:
- Daweta Zerê!

Gur dibêje:
- Tu bi defê, bi zirnê, an bi tenbûrê dawet dixwazî?

Di wê gavê de pezek dibêje gur (mesela):
- Em bi zirnê dawet dixwazin!

Institut kurde de Paris

Piştî wê daxwazê, pez ji mexel radibe û (zarûk) tev bi nikla dengê zirnê direqisin, li pey hevûdu kaşerêz dibin, hêdî-hêdî diçin û di binê pirê re derbas dibin.

Gur jixwe li keviyeka Pirê sekinî ye. Lê hêj di pêşî de gava ew û şivan peyivîne, gur di dilê xwe de her gumana wê peza ku desmal pê re hatiye veşartin kirîye û hîç wê ji çav nake, lepê xwe li pişta yên din dixe û yeko-yeko navnoçkan li wan dike, (mesela) dibêje:

- Ev mih qels e!

+ Ev bizin, gêj e!

+ Ev, şîrşihitî bûye!

+ Jixwe eva han xêtik e!

+ Eva han jî çilmoke ye!..

INSTITUT KURDE de PARIS · BIBLIOTHÈQUE
Institut kurde de Paris

Gur têkilî wan nabe hetanî ewa guman kiriye ku desmal pê re ye tê. Hingê ew bi girrkî xwe lê dixe, wê digire û ji xwe re dibe. Îcar eger desmal bi wê zarûkê re be, ew zarûk êdî nakeve nava leyztikê. Leyztik ji nû ve dest bi doreke din tê kirin, eynî kes dibe şivan û eynî kes jî dibe gur. Lê eger desmal ne bi wê zarûkê re be, hingê ew mîna pez dimare, dikale û şûnde vedigere tê nava kerî. Leyztik ji nû ve, careke din tê domandin. Vê carê îcar gur dibe şivan û şivan jî dibe gur, ji bedêla herdu zarûkên ku bûne pir jî, du hebên din têne hilbijartin.

**2-** Ji vê cureya *Pezkoguro* re *Leyztika Teşiyê* jî tê gotin. Lê ev ji ya li pêşiya xwe cuda ye:

Qefleyek zarûk di nava xwe de yekê dikin *şivan*, yekê dikin *gur* û yên din jî tev dibin pez. Piştre zarûk bi pişta hev digirin û kaşerêz dibin, şivan jî dikeve serê pêşî.

Darek yan qamçiyek di destên şivên de ye. Gur ji paş ve yan ji kêlekan ve, li gor dîtina keysa xwe kiçîmê pez dike. Gur kîjana ku bigre, wê ji dûvik derdixe û dibe. Lê belê dema gur kiçîm dik, pez ji berê direvin û bi vî alî ve, bi wî alî ve her çiv didine xwe û pişta hevûdu bernadin. Şivan jî bi darê di destên xwe de li gur dixe. Yek caran pirî ku pez ji ber gur direve, dûvik li pêşiya şivên dutew dibe û keysa wî çênabe ku li gur bixe. Carina jî, bi daweşandina darê şivên re, derb li zarûkan dikevin.

Eger şivan pezê xwe parast, gur jê vedikişe. Na eger şivan sivik nelipikî, gur ji paş ve yekê digre û ji wir dûr dibe. Ewa ku gur biriye, li wir disekine, dîsa gur vedigere ser pêz û yeke din dibe. Her wisan gur tê û her carê bi pezekê digire û ji xwe re dibe, heta ku şivan tenê dimîne. Lê eger şivan zîrek û mêrxas be, pezeka xwe tenê jî guraxwarî nake.

Institut kurde de Paris

# PIRSEMAL

Ev cûre leyztik xasma ji bo têgihîştin û tîjîfehmî û zîrektîya zarûkên piçûk tê çêkirin.

Belam piraniya rûniştevanên taxên bajaran, yên gundên boş û hemû gundên piçûk diyar e ku hevûdu dinasin. Îcar ji bo leyztikê gava zarûk li hev kom dibin, bi hawayekî sergirtî malan ji hev dipirsin. Di pirskirinê de hîç navên kesên di malan de nayête pirsîn, tenê bi jimara kesên di malê de û danasîna malan bi tiştekî din ê ku her kes pê dizane dipirsin.

Mesela, zarûkek weha dipirse:
- Maleka min heye, di malê de du kur û keçek, dê û bav hene. Ew mal, ya kê ye?

Kîjan zarûka ku wê malê bizanibe, tiliya xwe bilind dike û dibêje (mesela):
- Mala bavê Xelatê ye!

Eger ew zarûk rast bersîv bide, zarûkên din jê re çepik lê dixin. Û pirs li dû hev didomînin. Di nava wan de kî zêde bersîvên rast bide, ew dibe gula taxê/gund û yên din tev jê re rêzaniya xwe pêşkêş dikin.

Institut kurde de Paris

# AGIRXWESTIN

Bi vê leyztikê du zarûk dileyizin. Emê bêjin navê yekê **A** ye û navê ya din jî **B**-ê ye. Pêşî yek ji wan (mesela A) serê tiliyên herdu destên xwe digehîne hev, nava wan vedike û fireh dihêle. **B** jî tiliya xwe ya eşedê dixe nêv valayiya tiliyên A yên qilîçê û dibêje:
- Hatim agir.

**A** dibêje:
- Agir tune.

Piştre **B** tiliya xwe dixe valayiya di navbera tiliyên wê yên diduyan û dîsa dibêje: ***Hatim agir***. **A** dîsan dibêje ku *agir tune*.

**B** îcar tiliya xwe dixe valayîya sisiyan û dîsan agir dixwaze, ew jî dibêje ku *agir tune*. Lê dema **ku** tiliya xwe dixe valayiya di navbera tiliyên eşedê-beranî de û dibêje:
- Hatim agir.

**A** dibêje:
- Agir heye! Lê gurê manco li berê nittiriye. Ew yekî çavsorê diranqîç ê har e. Gava tu herî xênî û agir bînî, wê bêje "help" û xwe bavêje te.

**A**, bi wê gotina xwe re hema wisan zû tiliyên xwe ji hev berdide û bi herdu destan, bi destê **B**-ê hişk digre û dibêje:
- Wê gurê manco wiha bi te bigire.



Institut kurde de Paris

Leyztika Agirxwestinê



Institut kurde de Paris

# STÊRK

Ev leyztik ji bo pîvana hiş, aqil û têgihîştina zarûkên piçûk tê bikaranîn. Belam çendî ku zêdetir feqî li zarûkên gundiyan dikin, lê di malan de jî pê tê leyztin.

Gava zarûk di hinduriyekî de kom dibin, yekî mezin dibêje wan:
- Ez dikarim niha di vî qarçayî de stêrkan nîşanî we bidim!

Çaxê ew peyv tê gotin, mezinekî din ku bi wê leyztikê dizane, îcar ji bo ku ew zarûkan lê sor bike, dibêje:
- Tu nikarî. Stêrk li asîman in û tu jî li erdê, di binê vî qarçayî de yî! Çewan tu dikarî stêrkan nîşanî me bidî?

Bi gelş û nîqaşa *dikarî û nikarî* re, zarûkek dibêje:
- Ez dixwazim stêrkan bibînim.

Serê wê zarûkê dixin binê saqoyekî û milekî saqo tîk radikin hewa, ji jêr ve çavên wê didine binê milê saqo û dibêjin:
- Binêr! Ji xwe re li stêrkan binêre.

Di wê demê de binê taseke tije av, yan tiştekî ku dibiriqe carek-dido ji jor ve nêzî devê milê saqo dikin

Institut kurde de Paris

û dibêjin:
- Çewa tu stêrkan nabînî? Ka rind binêre!

Tasê hinekî li jora devê milê saqo digirin. Hingê ew zarûk binê tasê dibîne û dibêje:
- Erê! Wa ye ez stêrkekê dibînim.

Îcar yek wê tasa avê di devtetikê milê saqo re berî ser çavên zarûkê dide. Eger ew zarûk zîrek be, zû xwe dide alî û nahêle ku şil bibe.

Institut kurde de Paris

☆ ★ ☆

# ZIRNEZÎQ

Bilindayîyeke bi qederê metreyekê tê danîn û cihgirtî dibe, yan diguliyeke hewqas bilind di erdê de tê çikandin. Kêranekî dirêj, an rewtekî datînin ser wê bilindayî / diguliyê û ji herdu aliyan ve jî dengeya nêvî her mîna teraziyê çêdibe.

Her zarûkek li ser aliyekî siwar dibe û hevûdu nizm û bilind dikin. Bi wî hawayî yek bilind dibe û yek nizm dibe...

Institut kurde de Paris

Leyztika Zirnezîqê



Institut kurde de Paris

# FIRÎ-FIRÎ

Ev leyztik piranî ji bo zarûkên piçûk ên ku temenê wan di navbera sisê û heft salan de be tê çêkirin. Bi leytikê hem navên heywanên firende û yên nefirende bi wan didine fêrkirin, hem jî fêrbûn, têgihîştin û zîrektiya wan dipîvin.

Yekî mezin zarûkan li deverekê kom dike. Zarûk gerredor rûdinin û her yekê destekî xwe dike gilok, dirêjî pêşiya xwe dike û datîne erdê. Lê hemû tiliya xwe ya eşedê vekirî-tîk dihêlin û timî serê wê dileqînin, dihejînin û çep û rast dibin û tînin.

Ew kesê mezin, gava navê heywaneke firende dibêje û destê xwe bilind dike, divê ew zarûk tev dastên xwe rakin hewa. Îcar zarûka ku destê xwe raneke, bernavkekî lê datîne. Yan eger ew kesê mezin navê heywaneke nefirende bibêje û destê xwe bilind bike, divê zarûk tev destên xwe ranekin hewa. Lê zarûka ku destê xwe rake, hingê dîsa bernavkekî lê datînin.

Ew kesê mezin dev pê dike û navê heywaneka firende dibêje (mesela):
- Firî firî, kew firîîî!

Hingê pêwîst e ku zarûk destên xwe bilind bikin. Lewra kew heywanekî firoke ye.

Institut kurde de Paris

Lê eger ewê mezin (mesela) bêje:
- Firî firî ker firîîî!

Hingê pêwîst e ku zarûk destên xwe bilind nekin. Lewra ker heywanekî ne firoke ye.

Ew navên ku ji zarûkan re têne gotin, bilêvkirina wan gelekî dişûfe hevûdu. Îcar ji bo ka çi qeder zarûk dikarin ferqa wan navan û wan heywanan ji hev bikin. Hem jî wan heywanan bi zarûkan didine naskirin. Bipiranî navên weke yê *leg* û *beq*, *tajî* û *şamî*, *sûsik* û *kûçik*, *çîrik* û *berxik*, *qaz* û *baz* û gwd. têne gotin.

Institut kurde de Paris





# ÇAQOBERK

Li hin deveran ji vê leyztikê re *şaqolî* jî tê gotin. *Çaq* an *çîq*, herweha *çîloq* û *çîp* jî. nav in ji qorika meriv hetanî nig. Gava yek nigekî xwe davêje ber nigê yekî din û wî tera dike, tê gotin ku *şaqûliyekê avêt berê*.

Bi vê leyztikê, zarûkên di navbera salên heft û pazdeyan de, bihêzbûna xwe li hevûdu diceribînin. Yek nigekî xwe davêje ber yekî û bi destên xwe bi nava wî digre da ku wî terayî erdê bike. Lê biriya terakirinê zêdetir ji avêtina nig a ber nigê yê din çêdibe.

Institut kurde de Paris

INSTITUT KURDE de PARIS
• BIBLIOTHÈQUE •

Leyztika Çaqoberkê



Institut Kurde de Paris

# POTEPÊÇ

Gelek zarûk li deverekê dicivin. Yek ji wan merşikekê yan carcîm, şalik, mêzer, egal, lop, kilîm, emenî û gwd. bi ser xwe dadike û li ser nigan disekine. Yekî din jî dibe *Mele* û jê dûr disekine. Zarûkên din yeko-yeko li hawîdorê wî gerredor dibin û pehîn lê dixin. Çi cara ku pehînek lê bikeve, ew navekî dibêje. Eger pehîn ya xwediyê nav be, mele bi dengî dibûje *erê*. Îcar xwediyê pehînê merşik bi xwe dadike û yên din pehîn lê dixin.

Lê eger ew pehîn ne ya xwediyê navê ku hatiye gotin be, zarûka di binê merşikê de her wisan dimîne, heta ku navê xwediyê pehînekê rast bibêje.

Leyztik her wisan didomîne...

Institut kurde de Paris

# DARQÎTIK

Ev leyztik du cûreyên xwe hene:

**a)** Zarûkên xortik dibin du ber. Ji bo destpêkirinê, di nava xwe de pişk dikin. Îcar em ê navê berekê deynin **A** û navê bera din deynin **B**.

Rewşa Leyztikê: Du kevir bi qederê 20-30 cm. yî ji hev dûr û li hemberî hev datînin erdê. Li ber wan kortikekê çêdikin û navê wê *hoçk* e. Darekî zirav datînin ser wan herdu keviran. Kesên ku dileyîzin jî her yekê darekî zirav, ku bi dirêjî û ziravî mîna hevûdu bin (şiv), di destan de ye.

Mesela, emê bêjin di pişkê de bera **A**-yê kar kiriye. Di bera **A**-yê de çend kes hebin, tev li ba hoçkê kom dibin û dest bi avêtina darikê li ser herdu keviran dikin.

Hevalên bera **B**-ê jî ji wan dûr, belawela dibin û disekinin. Ji bera **A**-yê yek, serê şivika di destên xwe de dixe binê wî darikê ku herdu seriyên wî li ser keviran in û heta ku jê tê diheliqîne (davêje). Îcar pêwîst e ku hevalên bera **B**-ê, wî darikî li hewa bigrin. Eger yekî ji **B**-ê ew darik li hewa girt, dê bi şûnde bavêje ser hoçkê. Na eger negirtin û ew darik kete erdê, wê bera **A**-yê dest pê bike û dîsa li

Institut kurde de Paris

leyztikê bidomîne.

Lê eger yekî ji **B**-ê ew darik girt û bi şûnde avête ser hoçkê, ewçax ji bera **A**-yê kî keysa xwe bibîne, berî ku darik bikeve erdê, bi şivika xwe lê dixe û şûnde bi ser hevalên **B**-ê ve vedigerîne. Ewçax dora leyztikê dîsa dibe ya bera **A**-yê. Lê eger ew darikê ku davêjin li erdê ket, bera **A**-yê mesafa di navbera wî û hoçkê de bi şivika xwe dipîve. Eger ew mesafe weke dirêjîya şivikê hebe, dîsan bera **A**-yê kar dike, lê eger tune be leyztikê wenda dike.

**b)** Ev leyztik bi du kesan tê kirin. Herdu kes di nava xwe de ji bo destpêkirinê pişk dikin. Kesê kar dike, darikekî dirêj bi destekî wî ye û yekî kin jî bi destê din e. Ew, darikê kin davêje hewa û bi darikê dirêj lê dixe, lê dixe, lê dixe û lê dixe, nahêle ku bikeve erdê. Her lêxistinek, jê re puwanek e.

Mesela: Pênc caran li hewa lê xist û bi lêxistina şeşan re darik kete erdê. Vê carê wê ew bi darikê dirêj, li serîyekî wî darikê ku li erdê ye bixe û ji erdê bilind bike. Di berjêrhatinê de berî ku bikeve erdê, ew bi darikê di destê xwe de lê dixe û hildifirîne. Ew darik eger bi wê hilfirandinê here li kur bikeve erdê, ji cem wî hetanî devera ku lê ketiye erdê, wê bi darikê dirêj yê di destê xwe de bipîve. Her jimarek jê re puwanek e.



Institut kurde de Paris

Mesela, pêşî pênc puwan girtibûn, vê carê jî deh puwan girtin, ew dibe xweyîyê 15 puwanan. Û dîsan dora leyztikê, ya wî ye. Lê eger ku darikê kin avêt hewa û di berjêrhatinê de, darikê dirêj lê nexist nehingavt û darikê kin ket erdê, puwanên ku berê girtibûn jî, wenda dike û dor dibe ya hevalê din.

Institut kurde de Paris

# TEP

Bi vê leyztikê piranî zarûkên kurînî yên ku temenê wan di navbera 12 û 18 salan de be, dileyzin. Bihindikî divê çar kes bin û zêdetir...

Li navrastekê *hoçik* çêdibe. Piştre li gorî jimarê, xortik dibin du ber û ji bo destpêkirinê di nava xwe de pişk dikin. Bera ku qezenc dike, dertê û bera ku wenda jî dike hoçkê diparêze. Du cûreyên vê leyztikê hene.

**a)** Bera ku hoçkê diparêze, her yekê wan dide ser her yekê ji bera derketî. Hevalên bera derketî jî direvin û bi çolê û nava malan ve diçin.
Gava tep li kîjanê bera derketî bikeve, ew pûç dibe û ji leyztikê derdikeve. Lê gava yekî ji bera derketî bi bez di navbera hoçkê û yekî hoçkparêz re derbas bibe, ewê hoçkparêz jî pûç dibe û ji leyztikê derdikeve.

Eger tep li hemû hevalên bera derketî bikeve (ew ber) sexer û mat dibe, qanekî dixwe û parastina hoçkê dibe dora wê. Îcar bera din derdikeve û eva hoçkparêz dide serê, tep li hevalên wê dixe û her wisan didomîne...

Institut kurde de Paris


Leyztika Tepê

b) Xortik dibin du ber û bi pişkê dest pê dikin. Hevalên ku hoçkê diparêzin, her yekê wan yekî ji bera derketî bo xwe kifş dike û dide ser pişta wî.
Ji bera hoçparêzan kî giha wî kesê ji bera derketî ku ji xwe re kifş kiribû û tep lê xist, ji şûna lêxistina tepê, lê siwar dibe û tê li ber hoçka xwe peya dibe.
Leyztik wisan tê domandin ta ku hev pûç dikin û dest bi doreke din dikin.

Institut kurde de Paris

# HOTO-MOTO*

Bipiranî zarûkên ku temenê wan di navbera 10-17 salan de be, bi leyztika *Hoto-Moto*yê dileyîzin.

Gelek zarûk li deverekê dicivin. Her yek ji wan çend lib gûz, an fistiq, an jî findiq ji xwe re hazir dikin. Balgîv an tiştekî wisan direqêfine dîwarekî, yan devereka bilind. Piştre ew, yeko-yeko û li dû hev, her carê yek gûzeka xwe ji ser serê balgîv berdide. Ew gûz here li kur bisekine, li şûna xwe dimîne û kes dest nadê. Piştre yekî din gûza xwe berdide. Ha wisan gûz li dû gûzê têne berdan.

Di wê navê de îcar eger gûza kî here li kîjan gûzeka ku berê hatiye berdan û çûye li deverekê sekiniye bikeve, ew gûzên li erdê tev ji xwediyê wê re ne.

Hin caran 20-30 gûz wisan li erdê sekinî ne û gûzek diçe li yekê dikeve, xwediyê wê gûzê ew gûzên li erdê tev ji xwe re berhev dike û jê re dimînin.

Leyztik her wisan didomîne, heta ku zarûk hevûdu ji gûzan qar dikin.

---

* Ev leyztik li hêla Bazîdê û Qersê tê leyztin.

Institut kurde de Paris

# ZÎÇ

Navê leyztikê çewa *Zîç* e, jê re *Darqîçik* jî tê gotin. Di leyztikê de, ber û pişk nînin. Bipiranî zarûkên ku temenê wan di navbera 10-17 salan de be, pê dileyizin. Her yek ji wan, çend şivên bi qederê milekî dirêj û sertûj î zirav ji xwe re hazir dikin. Navê wan şivan jî her *zîç* e.

Devera leyztikê poxan e, yan jî erdeke nerm e. Pêşî yek şiveka xwe bi destekî bilind dike û bi zirp li erdê dixe. Şiv qederî di erdê de diçe û çik dimîne. Piştre yekî din, eynî wisan bi zirp şiva xwe dadiweşîne erdê, da ew wê şiwa ku berê di erdê de hatiye çikandin tera bike. Îcar kê ji wan şiva kê tera bike, ew şiv jê re ye.

Zarûk tev, her wisan yek li dû yekî şivikên xwe dadiweşînine şivikên hevûdu û teradikin, an jî tera nakin.

Lê eger tevan şivikên xwe daweşandin û ku şivikên hev terayî erdê nekirin, îcar ewê ku cara pêşî şivika xwe daweşandibû, şivika xwe ji erdê dikişîne û careke din diweşîne şivikên hevalên xwe. Hingê keysa daweşandinê li kîjan şivika çikandî xweş bê, lê dixe. Piştre yê ku li dû wî şivika xwe daweşandibû, diweşîne şivikên çikandî. Her wisan didomîne.

Institut kurde de Paris

Leyztika Zîçê



Institut Kurde de Paris

# TÎR Û KEVAN

Di vê leyztikê de piranî xortik û xort dileyizin. Lê hin caran zilamên navsere û yên kal jî xwe ji xweşiya wê bê par nahêlin.

Leyztik bi du merivan tê kirin. Herweha kesên ku pê dileyizin, birî û zexmbûna xwe li pêşberî hevûdu diyar dikin.

Yek dibe *tîr* û yek jî dibe *kevan*. Yê ku dibe kevan, herdu nigên wî bi hev ve û herdu destên wî jî bi hev ve têne grêdan. Yê ku dibe tîr, nigekî xwe di navbera herdu çîqên kevanî re derbas dike, nigê din jî di navbera herdu milên wî re derbas dike û serê xwe di binê zikê wî re dibihurîne. Bi wî hawayî, pişta yê ku bûye tîr û zikê yê bûye kevan digîjine êkdu.

Îcar kesê ku xwe kiriye tîr bi zirpa nigên xwe dest û nigên kevanî bi ser hev ve tîne. Kevan jî bi dest û nigên xwe, herdu nigên wî ji hev dûr dike. Ha wisan ew li ber hevûdu didin û zorî didine hev. Îcar kî ji wan zora kî bibe, ew leyztikê qezenc dıke û diyar dibe ku yê bi hêz jî ew e.

Institut kurde de Paris

# XAR Û KAP

Ev leyztik du cûreyên xwe hene: *Mîr û Ker*, *Xar û Kap*.

**a)** *Mîr û Ker*: Leyztik bi du kesan tê kirin û bi kapekî tê leyztin.

Kap, çar aliyên xwe hene. Navê aliyekî *mîr* e, navê aliyekî *ker* e, navê aliyekî *pik* e û navê aliyekî jî *diz* e. Herweha ji aliyê diz re *sofî* jî tê gotin.

Herduyên ku dileyizin her yekê wan aliyekî kap, (an mîr, an ker) ji xwe re kifş dike û bi dor davêjin erdê. Îcar ew, li gorî şirt û tiştên ku di navbera wan de çêbûye, hevûdu dibin, yan jî qan dixine ser êkdu.

**b)** *Xar û Kap*: Di vê leyztikê de pir kes dileyizin. Mesela, eger sê kes bin, em ê navê yekî deynin **A**, navê yekî deynin **B** û yê yekî jî deynin **C**.

Her yek ji wan kapekî xwe li erdê bi rêz û bi qederê gavekê ji hev dûr datîne. Her yekê xareka wî jî pê re heye. Li pêşiya kapê pêşî, bi qederê du-sê gavan dûr niqutek bi navê *hoçk* tê kifşkirin. Ew hersê, di nava xwe de, ji bo avêtina cara pêşî pişk dikin. Yê kar dike, pêşî ew xara xwe ji devera hoçkê davêje kapan.

Institut kurde de Paris

Leyztika Xar û Kap



Institut kurde de Paris


Mesela: Pêşî **A**-yê xara xwe avête kapên rêzkirî. Eger wî ew kap hingavtin, çend lib terayî erdê kiribin, wan ji xwe re hiltîne. Û devera ku xara wî here lê bisekine jî, her li wir dihêle. Piştre (eger kapên rêzkirî mabin) îcar **B** xara xwe davêje wan kapên rêzkirî. Eger **B**-ê ew hingavt, kapên ketî ji xwe re hiltîne. Eger kap nehingavtin, devera ku xara wî here lê bisekine, li wir dihêle. Eger ku kapên rêzkirî mabin, îcar **C** xara xwe davêje wan. Ew jî her mîna **A** û **B**-ê, dike.

Mesela em ê bêjin **A** û **C** her yekê wan kapekî terakirine û ji xwe re hildane, lê **B** kap hilnedaye. Vê carê **A** ji devera ku xara wî lê sekinî bû, xara xwe davêje wî kapê ku maye. Eger kap bihingêve ji xwe re hiltîne, lê eger nehingêve, xara wî here li kur bisekine, her li wir dihêle. Piştre îcar **B** xara xwe davêje wî kapî. Eger **B**-ê ew kap hingavt, ji xwe re hiltîne. Eger nehingavt, îcar **C** xara xwe davêje wî kapî. Eger **C**-yê ew hingavt, kap ji xwe re hiltîne. Eger nehingavt, îcar **A** xara xwe davêje wî kapî...

Leyztik her wisan seredor dibe heta yekî ew kapê ku maye hingavt û ji xwe re hilanî.

Eger ew kapê ku maye hate hingavtin, îcar ew hersê heval xarên xwe davêjine yên hevûdu. Lê dora avêtinê ya **C**-yê ye.

Institut kurde de Paris
INSTITUT KURDE de PARIS BIBLIOTHÈQUE



Xar û Kap (II)

Institut kurde de Paris

Pêşî **C** xara xwe ji wê devera ku xara wî lê sekinî bû davêje xara **A**-yê. Eger lê xist, wî kapê ku **A** berê hildabû jê distîne. (Emê bêjin sitend). Û devera ku xara **C**-yê here lê bisekine, li wir dimîne.

Li vir **A** leyztikê wenda dike û jê derdikeve. Vê carê leyztik di navbera **B** û **C**-yê de didomîne.

Pêşî **B** xara xwe davêje xara **C**-yê. Eger **B**-ê xara **C**-yê hingavt, kapekî jê distîne. Eger nehingavt, îcar **B** xara xwe davêje xara **C**-yê.

Leyztin bi vî awayî dom dike, heta ku ji **B** û **C**-yê yek, hersê kapan qezenc dike. Piştre dest bi doreka din tê kirin.

Çewa ku me li jorê got, hemû carên leyztikê her wisantêne domandin...

(Kesê ku di leyztikê de wenda dike û kapên xwe namînin, dikare bi deyn jî bi hevalên xwe re bileyze. Îcar ew di leyztikê de eger kap an jî xar qezenc bike, pêşî deynê xwe dide. Lê eger xara wî hate hingavtin, deyndartir dibe û deyn dikeve ser deyn, piştre deynê xwe dide.)

Institut kurde de Paris

# MÎR Û KIZÎR

Leyztika *Mîr û Kizîr* bi niftikê (şixav) çêdibe. Navê herdu seriyên bilind ên niftikê *mîr* e, *kizîr* jî navê herdû kêlekên ku bi barûd in û navê aliyê bi gûn (reng) *ker* an *sofî* ye, navê aliyê bê gûn jî *diz* e.


Kesên ku dê bileyzin çi zarûk û çi jî mezin li hevûdu kom dibin û grover rûdinin. Pêşî, dest pê dikin û tev bi dor niftikê davêjin erdê. Yê ku niftikê qûç anî dibe *mîr*, yê ku bi kêlekî anî jî dibe *kizîr*.

Kizîr egaleke honayî (yan tiştekî wisan ji bo lêxistina destan) digire destên xwe û ji xeynî mîr û kizîr ên din bi dor li pey hevûdu niftikê davêjin erdê.

Di avêtina niftikê de kesê *ker* an *diz* hat, mîr ferman dide ku kizîr li destên wî/wê bixe. Kizîr, bi wê egala honayî, bi qederê jimara ku mîr gotiye ew qas derb lê dixe.

Ewên ku niftikê davêjin, kî niftikê qûç anî mîrîtîyê qezenc dike û mîrê berê ji mîrtîyê dikeve. Ji wan kî niftikê kizîr jî anî, kizîrtiyê distîne û kizîrê pêşî ji kizîrtiyê dikeve. Bi wî hawayî li avêtina niftikê tê domandin.

Institut kurde de Paris



Mîr û Kizîr

# VIZIK

Çêkirina *Vizzikê*: Vizzik, ji dar tê çêkirin û dişûfe serê teşiyê, lê binê wê grover e û her berjêr diçe zirav dibe, heta ku serê binî tûj dibe. Di wê devera tûj de bizmarekî sergrover jî heye. Hawîdorê vizzikan bi boyaxa rengîn tê nexşandin.

Bikaranîna Vizzikê: Serê benekî dirêj li tiliya navîn tê grêdan û serê din jî li vizzikê, ji binî hetanî jorê tê gerandin. Piştre meriv serê wê yê qalind dide binê tiliya eşedê û serê zirav jî datîne ser tiliya beranî û hincirî davêje erdê. Bi avêtinê re, benik tê kişandin û vizzik li erdê digerre.

Devera ku vizzik lê tê avêtin, divê ku hilûstankî û şayîk be. Piranî li ser qeşemê an kevirekî mermer tê avêtin.

Zivirandina vizzikê bi kîjan alî ve çêbibe, grêdayê bi grêdana benikê ku lê tê gerrandin e. Eger benik rast lê bê gerrandin çep digerre, çep lê bê gerrandin rast digerre.

Du kes û zêdetir vizzikên xwe davêjin ber hevûdu. Vizzika kî dawîn ku bisekine, ew (eger şird jî hebe) qezenc dike.

Institut kurde de Paris



Leyztika Vizzikê

Institut kurde de Paris

Gelek caran avêtina li ber hevûdu ya vizzikê, li ser kefa destan jî tê kirin. Vizzika kî zêdetir ku li ser kefa destê wî bigerre, ew qezenc dike.

(Çaxê vizzik li dora xwe dizivire, meriv tiliyên destekî xwe ji hevûdu fireh dike û hincirî destê xwe davêje binê wê, ew hiltîne û tîne ser kefa destê xwe. Ewçax vizzik li ser destê mirov dikare demeke dirêj bigerre.)

Institut kurde de Paris

# GUSTÎL

Ev leyztik du cûreyên xwe hene: *Leyztika Mezinan* û *Leyztika Piçûkan*.

a) Leyztika Mezinan.

Ciyê leyztikê, li hinduruyekî ye. Xasma di zivistanan de gava gundî li malekê dicivin, piranî bi gustîlê dileyizin. Hemû li ber qurma dîwêr, lê ne pê ve rêz dibin, tev destên xwe didin paş xwe û gustîlekê li hev digerrînin. Merivek li nava wan şipya disekine û li wan dinere, ka bê wê gustîl bi kî re bê veşartin. Ewê şipya kêm-hindin bi bevz û libata yên rûniştî têdigîje ku gustîl bi kî re dimîne.

Kesên rûniştî, ji serî ve, yek gustîlê dixe destên xwe û piştre mîna ku dide yê li kêleka xwe, ew jî mîna ku dide yê li kêleka xwe û ew jî mîna ku dide yê li kêleka xwe... Bi wî hawayî ew gustîlê li hevûdu digerînin. Lê ji hewqasa mirov tev, gustîl bi yekî re dimîne.

Piştî ku veşartina gustîlê kuta bû, zilamê çavdêr dibêje wîyê ku guman kiriye ango gustîl pê re hatiye veşartin, "*Gustîl bi te re ye*!" Îcar eger gotina wî rast derket, leyztik dipelişe û ji nû ve dest bi careke din tê kirin. Na eger guslîl ne pê re be, ewê çavdêr pûç dibe û di ciyê xwe de rûne, têkilî ley-

ztikê nabe.

Îcar ewê ku jê re hatiye gotin ku "Gustîl bi te re ye" radibe ser nigan û çavdêrî dike. Yên rûniştî ji nû ve dest pê dikin û gustîlê di nava xwe de vedişêrin, ewê çavdêr jî li derxistina wê didomîne.

Eger di cara pêşî de evî jî gustîlê dernexist, ew jî rûdine û ji leyztikê pûç dibe. Îcar yê kû jê re gotiye ango "gustîl bi te re ye" radibe ser nigan û çavdêrî li veşartina gustîlê dike.
Leyztik, her bi vî hawayî tê domandin...

**b)** Leyztika Zarûkan:
Qefleyek zarûkên xortik dibine du ber. Piştre herdu ber her yekê di nav xwe de yekî hildibijêre. Ewê hilbijartî dibe serok. Li hin deveran ji serok re "mîr" jî tê gotin.

Herdu serok ji bo destpêkirina leyztikê di nav xwe de pişk dikin. Kî ji wan pişkê kar dike, pêşî ew dest pê dike. Piştre herdu ber her yekê hinek tiştên xwarinê weke fêkî-çerez hazir dikin û hêj dileyizin. Ew, eger çend caran jî ku bileyzin, kifş dikin. Di dawî de kîjan ber kar dike, ew tiştên xwarinê tev jê re ne.

Serokê bera ku kar kirîye, gustîlekê di nava hevalên xwe de yeko-yeko digerîne, lê bi yekî re vedişêre. Veşartina gustîlê, li diyarî çavên bera din tê kirin.

Institut kurde de Paris

Herweha serok dikare gustîlê bi xwe re jî bihêle. Piştre ji serokê bera din dipirse:
- Gustîl bi kî re?

Hevalên bera din tev, gumana ku wê gustîl bi kî re be dikin û bi serokê xwe didin zanîn. Lê ji xeynî serok pê ve wekî din kesek ji wan napeyive. Serok navê yekî hildide, ango wê gustîl pê re be, dibêje (mesela):
- Gustîl bi Rostem re!

Eger gustîl bi Rostemî re be, ew qezenc dike û dora leyztikeke din jî dibe ya wan. Lê eger ku rast derneket, îcar serok bi xwe, wî kesê ku guman dike ango gustîl pê re ye, navê wî hîç nabêje, wî kesî dihêle paşiya paşîn û navên wan kesên ku guman dike gustîl ne bi wan re ye dibêje. Di wê ortê de eger gumana wî rast derket, qezenc dike û dora leyztikeka din jî distîne. Na eger şaş derket, leyztik dîsan ji bera ku pêşî dest pê kiribû re dimîne.

Li leyztik wisan tê domandin, heta ku berek wan tiştên xwarinê hemû qezenc dike.

Institut kurde de Paris

# FÎNCAN

Ev leyztik kêm-zêde mîna *Leyztika Gustîlê* ye. Zarûk dibin du ber. Her berek, serokekî ji xwe re hildibijêre. Navê serok, *mîr* e. Piştre ew ji bo destpêkirinê, pişk dikin. Kîjan bera kar dike, pêşî ew dest pê dike.

Heft fîncan serdev diqelêbin erdê. Hevalên bera ku kar nekiriye, tev pişta xwe didin fîncanan. Mîrê bera ku kar kiriye gustîlekê dixe binê fîncanekê ji wan her heftan. Hevalên bera din berê xwe vedigerînin û tev ji serokê xwe re, bi guman ku gustîl di binê kîjan fîncanê de ye dibêjin. Serokê wan jî, wê fîncanê radike. Eger gustîl di binî de be, ew leyztikê qezenc dikin û dora careke din dibe ya wan. Lê eger ne di binê wê de be, îcar gumana kîjan fîncana ku gustîl di binî de ye dikin, dihêlin paşî û serok fîncanên din radike.

Serok kîjan fîncana hildide, dibêje: *Ev pûç...* Îcar eger gustîl di binê fîncana herî dawîn de derket, ew leyztikê qezenc dikin. Lê eger gustîl di wê navê de derket, ew leyztikê wenda dikin.

Di leyztikê de pêwîst e ku gustîl yan bi bilindkirina fîncana pêşî yan bi bilindkirina fîncana paşî re bê dîtin.

Institut kurde de Paris

# MAMÊ LÛS

Ev leyztik xasê bi zarûkên kurînî, xort û zilaman ve ye. Bi du kesan tê kirin, yek jî li wan dibe çadêr û civat li wan temaşe dike. Çavên du kesan têne grêdan û li navrasta xênî rûdinin, her yekê ji wan bi guşê balgîvekî digire û her yekê egaleka honayî jî bi destan e, yan jî qamçî, qayiş, kindîr û hwd.

Dema ew dest bi leyztikê dikin, çavdêr bi balkêşî li wan dinêre, da herdu li hev dek mekin û di binê potikên ku çavên wan pê hatine grêdan re hevûdu nebînin.

Îcar em ê navê yekî **A** ye, navê yê din jî deynin **B**. (Mesela) **A** bi dengekî berz dibêje:
- Mamê Lûûûs!


**B** jî her wisan hincirî dibêje:
- Çi ye, Mamê Lûûûs!

**A** dibêje:
- Hate te derbek bênamûs!

**B** jî dibêje:
- Tu ji ba xwe ve bê minet î! (yan jî dibêje)
+ Neyaho ji ba te!

Piştî vê gotina **B**-ê ya dawîn, **A** bistikekê disekine û guhên xwe li pêjna **B**-ê tapêl dike. Herweha ew ji bo

Institut kurde de Paris



Leyztika Mamê Lîls

daweşandina derbê jî xwe bi keys û amade dike. Di wê sekna **A**-yê de, îcar **B**-ê xwe ji tîra balgîv, ango mîna ku xwe veşêre bi aliyekî ve dide. Lê hîç, yek ji wan jî destê xwe ji balgîv bernade.. Îcar piştî **A** hizir kir ku ango wa **B**-ê rind xwe veşart, **A** bi pêjnê gumana kîjan alî kiribe ku **B**-ê xwe li wî alî veşartiye, derba xwe dadiweşîne.

Eger derb li **B**-ê bikeve yan lê nekeve, tiştekî nagihêre. Piştre dor dibe ya **B**-ê. Her **B** jî wisan eynî tişt dibêje **A**-yê û derba xwe dadiweşîne.

Leyztik bi wî awayî tê domandin...

Institut kurde de Paris

# SÊRMÛSÊ

Ev leyztik bi du kesan tê kirin. Piranî xortik, zilamên mezin û hin caran kesên navsere jî pê dileyizin. Ew, ji bo despêkirinê di nav xwe de pişk dikin. Yê kar dike, pêşî ew kapên xwe davêje erdê.

Her yekê wan sê kap hene. Di her kapekî de çar alî hene. Navê aliyê kap ê rast *mîr* e, aliyê niqrokî *ker* e, alîyê kort *diz* (Sofî jî dibêjin) e û aliyê bi niçik jî *pik* e.

Cara pêşî, her yek sê caran li pey hev heqê wî yê avêtinê heye. Yê ku davêje, hersê kapên xwe bi destekî digre û davêje erdê. Eger hersê kap her yekê texlîtek hatin, meriv puwan nastîne. Lê eger hersê kap yekrû hatin, meriv dibe xwediyê sê puwanan û li avêtinê didomîne. Eger du kap yekrû bên û yek cuda bê, ew kapê ku cuda hatiye dîsa ji nû ve tê avêtin. Eger ew kap mîna herduyên din bê, meriv dibe sisê û dora avêtinê dîsa ji meriv re ye. Lê ku ew kap bi awayekî din hat, meriv dişewite û heqê avêtineka din jî wenda dike. Hingê dora avêtinê dibe ya hevalekî din.

Eger hersê kap di avêtina cara pêşî de yekrû bên, meriv dibe xwedîyê sê puwana. Eger di avêtina cara diduyan de jî yekrû werin, puwanên meriv dibin şeş.

Institut kurde de Paris

Eger di avêtina cara sisiyan de jî yekrû werin, meriv dibe xwediyê neh puwanan. Lê eger kap di avêtina carên paşî de yekrû neyên, kapê ters kîjan be dîsa tê avêtin. Îcar eger wiyê ters bavêje û dîsa ters bê, hingê meriv puwanên heyî jî wenda dike.

Kesê ku pêşî kap davêje û dibe xwedîyê sê puwanan, cara diduyan û cara sisiyan jî heqê avêtinê jê re ye, bi şertê ku di her avêtinekê de sê puwan bistîne. Lê eger hersê kap yekrû nehatin, an jî kapê ku ters hatibe bi avêtina cara diduyan ku nebû mîna yên din, puwanên wî ger ku çiqas bin jî dibin *binbehr* û jê re tenê hersê puwanên pêşî dimînin.

Eger yê pêşî hersê dorên xwe temam kirin, dor dibe ya hevalê din û ew jî sê caran kapên xwe davêje. Piştî ku wî dora xwe temam kir, dîsa dor dibe ya merivê ku pêşî avêtibû. Îcar ji vir û pêve her carê meriv carek tenê kapên xwe davêje.

Bingeha jimara pêşî sisê ye û bingeha jimara paşî jî deh e. Mesela: Eger meriv xwediyê neh puwanan be, lê ku di avêtina cara çaran de puwan negirtin, ji sisiyan pêve puwanên din tev dişewitin. Di avêtina cara çaran de eger meriv bi yek avêtinekê sê puwan bistîne, jimara puwanên meriv ku neh in, dibin duwazdeh. Eger nebin duwazdeh, meriv dibe şeş. Lê eger hersê kap her yekê texlîtek hat, vê carê heq heye

Institut kurde de Paris

ku meriv bi fîtoka xwe kapekî bavêje li yên din bixe. Bi lêxistina her yekî re meriv puwanekî ji xwe re qezenc dike. Ji ber vê yekê, heqê meriv heye ku careka din jî bavêje.

Eger jimara puwanên meriv ji dehan derbas bû, bingeha puwanan dibe 16. Yanî heta ku puwan nebin 16 û meriv bişewite, meriv dadikevin deh puwanan. Eger puwan ji 16-an derbas bûn, bingeha wan dibe 2O. Yanî eger puwanên meriv 19 bin jî û meriv bişewite, puwan dadikevin 16-yan.

Di leyztikê de *qoq* heye. Eger kapek li ser guşekî xwe çik bê, puwanên meriv çiqas hindik bin jî, rasterast puwanên meriv dibine 2O.

Kesê ku puwanên xwe gihandin 2O î, vê carê ew bi guhê yê din digre û dibêje:
- Hillerî millerî, piçek ... û piçek ... ji vî heywanê kerr î lal re davêjim pişta derî. Te ji çi?

Ew heval dibêje:
- Min (mesela) ji du pik û mîrekî! (Yan jî dibêje: Mîrek û du diz. Yan dibêje: Dizek, mîrek û pikek (Ew heval, ji çar ruyên ku di kapekî de hene, navê sisiyan dibêje).

Piştre evê ku bi guhê hevalê xwe girtiye, hersê kapên xwe davêje erdê. Eger hersê kap, çewa ku yê guhpêgirtî

Institut kurde de Paris

gotiye hatin, ew ji pêgirtina guhgê xwe difilite. Eger kap ne wisan hatin, ê ku bi guhê wî girtiye careka din "Hillerî millerî..." jê dipirse û wisan li leyztikê didomîne, heta ku sê ruyên kap mîna hevûdu werin.

Institut kurde de Paris

# HÊK

Ji zarûkên heftsalî bigir hetanî xortan û zilamên mezin tev, her kes bi *Hêkê* dileyize.

Her carê du kes bi hevûdu re dileyizin. Pêşî her yek ji wan zexmbûna hêka xwe bi diranên xwe diceribîne û sê-çar caran serê hêkê li diranên xwe dixe û didoqîne. Bi derxistina dengê ji diran û hêkê, ew kes dizane ku hêka wî zexm e yan pellt e.

Navê aliyê tûjik ê hêkê *serî* ye û navê aliyê tepişokî *binî* ye. Peyva ji bo despêka leyztika hêkê weha ye:
- Serê min û binê te.

Yê din dibêje:
- Na. Serê min û binê te.

Yê pêşî dibêje:
- Binê te û serê min.

Yê din dîsa dibêje:
- Na. Serê min û binê te.

Ev gotinên *ser û bin*, ên hêkê ne. Piştre herdu bi awayekî li hev dikin. Ji herduyan yek hêka xwe dixe nava destekî xwe, serê wê di navbera tiliya eşedê û beranî re hindik derdixe. Îcar hevalê din eynê wî serî, yan binê hêka xwe li hêka hevalê xwe dixe. Bi wê lêxistinê, eger hêka kî bişike, ew hêk digîje xwe-

Institut kurde de Paris




Institut kurde de Paris

diyê hêka ku ne şikestî ye.

Leyztika hêkê, wisa didomîne û bi şikandina hêkan, hêk ji hevûdu distînin.

Piştre leyztikvanên leyztika *Hêkê* tev bi hevûdu re diçin malekê yan li çolekê û wan hêkên şkestî ji xwe re diqelînin û bi hev re dixwin.

Institut kurde de Paris



# MEŞKA DIMSÊ

Di vê eyztikê de piranî xortik û xort dileyizin. Yek xwe dide ser çapelûkan û yek jî lê siwar dibe. Yê ku di binî de ye, herdu nign û herdu destên yê li xwe siwar li navtenga xwe (dest bi dest ve û nig bi nig ve) grêdide.

Navê yê siwar *Meşka Dimsê* ye. Kevçiyekî mezin, yan çoçikek an jî heskek di destên yê li binî de ye û her dike gazî:

- Ha werin dimsêêê! Ha werin dimsê...

Wê hingê zilamek ji civatê radibe, tê ba wan ku ango dimsê bikire, ji dimsfiroş dipirse:

- Dimsa te bi çi ye?

Xwediyê dimsê dibêje:

- Ka pêşî dimsa min tahm bike, piştre bihayê wê bipirse!

Ewê ku meşka dimsê li pişta wî ye, çoçik an kevçiyê di destên xwe de, ji paş ve li qorika meşkê (yê li xwe siwar) dixe û dide destên kiroxî. Kirox jî wê çoçikê ji destên wî digire û bi ser devê xwe ve diqelibîne, herwekî ango dimsê vedixwe. Lê, ew dimsê naeyişîne û dibêje:

- Tahma dimsa te, ne xweş e, ez nakirrim.

Institut kurde de Paris

Piştre xwediyê dimsê çoçika xwe jê distîne û teq-req li hingilên (ning) meşka dimsê dixe û dîsa çoçikê dide destên kiroxî. Kirox dîsa herwekî dimsê tahm dike, lê ew vê carê jî dimsê naeyişîne û çoçikê dide destên xwedî. Dimsfiroş dîsanê çend caran çoçikê li hingilên (dest) meşkê dixe û careke din dide destên kiroxî da ku tahm bike.

Leyztik her wisan didomîne, heta ku dawî lê tê.

Institut kurde de Paris

# LEYZTIKÊN MEZINAN

## BEŞ - II

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

# SÊBERK


Navê vê leyztikê ji sê beran (kevir) hatiye girtin. Lê jê re li hin deveran *Çeqûberk* jî tê gotin. Di leyztikê de kevirok (ber) hevûdu girêdidin û riya libatê nadine hev.


Xêzkirina *Sêberkê*, weha ye: Li ser textikekî yan li ser ferşekî, çargoşeyek tê çêkirin û di nava wê de mîna xaç, ji ser nîvê aliyekî hetanî aliyê din du çixêz seranser têne kişandin. Tevî çar guşan û di nêvî de devera ku çixêz ketine ser hevûdu, neh ciyên kevirdanînê çêdibin. Kevirên ku li ser wan nuqteyan têne danîn jî şeş heb in.

Du kes, her yekê ji xwe re sê kevirokan hazir dike. Yek, libek ji wan kevirokên xwe datîne ser niqutekê, piştre yê din kevirokekî xwe datîne ser niqutekê û wisan yek li dû yekî kevirokên xwe datînin heta ku diqedin.

Ewê ku pêşî berika xwe daniye, libata pêşî jî her jê re ye û dileyizin, heta ku berikên yekî ji wan asê dibin û riya libatê jê re namîne. Ew çax yê ku berikên wî asê mane, leyztikê wenda dike.

Institut kurde de Paris




Institut kurde de Paris

# NEHBERK

Ev leyztik bi du kesan tê kirin û her yekê wan neh berik (kevirok) hene.

Sê çargoşe di nava hev de têne çêkirin. Pêşî çargoşeyeke ku her aliyekî wê li dora 3O cm. yî be, tê çêkirin. Çargoşeyek di nava çarkoşeya pêşî de li dor 25 cm. yî û çargoşeya sisiyan jî di nava çargoşeya diduyan de li dora 2O cm. yî tê çêkirin. Piştre li ser her çar aliyên hersê çargoşeyan, tam li nêvî û bi awayê ku hersê xetan digel êk girêbide, çar xêz têne kişandin.

Îcar herdu kesên ku dileyizin, kevirên xwe bi dorê, her carê libek li dû hev datînin ser niqutên ku xaz gihandine hevûdu, heta ku diqedin. Lê leyztikvanî kîjan devera ku bixwazin, berikên xwe datînine ser wir.

Berik çaxê di ser hev re qevaz bidin, hevûdu dihingêvin. Yanî berikeka kîjan hevalî gava ku di ser berikeka yê din re bihurî, bi şertê ku pêşiya wê vala be, ew berika hevalê din tê hingavtin û pûç dibe. Herweha di leyztikê de yê ku karibe sê berikên xwe li ser tîrekê jî rêz bike, ew leyztikê qezenc dike û dibêje "rêz" û dest bi doreke din tê kirin.

Leyztik wisan didomîne, heta ku yek berikên yekî diqedîne.



Institut kurde de Paris

# DAM

Leyztika herî ku tê naskirin û piraniya xelkê jî ku pê dileyîze, *Dam* e.

Çêkirina damê weha ye: Neh xazên weke hev bi qederê 40-50 cm. yî dirêj û bi qederê 3-4 cm. yî ji hev fire têne kişandin. Neh xazên din jî eyni wisa û li ser wan, lê bi beretersî têne kişandin. Bi wî hawayî, ji her aliyekî ve heşte heşt malik çêdibin. Civana malikan dibe 64, ya xazan jî 81 e û jimara berikên leyztikê jî 32 ye. Herweha navê herdu rêzên malikan ji aliyê mirov ve jî dam e. Malikên damê, ji vê mezintir jî têne çêkirin.

Di leyztika damê de du kes bi hevûdu re dileyzin û her yekê wan 16 berik (kevirok) hene.

Mesela, em ê navê yekî deynin **A** û navê yê din jî deynin **B**. Îcar **A** û **B**, her yekê wan li aliyekî damê rûdine. Her yekê ji aliyê xwe ve, berikên xwe datînin malikên rêza didu û ya sisiyan. Piştî ku danîna berikan temam bû, ji herdukan yek dilibite. Libitandina berikan jî bi dor e. Libatek **A** dike û libatek B dike û wisan didomînin.

Hingavtina berikan weha ye: Berikek di ser yekê re hildiqevêze malika ku li pişt vala be. Bi wî hawayî ew berika hingavtî pûç dibe. Herweha berikêk dikare

Institut kurde de Paris

| | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | DAM | | | | |
| ♥ | ♥ | ♥ | ♥ | ♥ | ♥ | ♥ | ♥ |
| ♥ | ♥ | ♥ | ♥ | ♥ | ♥ | ♥ | ♥ |
| | | | | | | | |
| | | | | | | | |
| * | * | * | * | * | * | * | * |
| * | * | * | * | * | * | * | * |
| | | | DAM | | | | |

Institut kurde de Paris

sê-çar-pênc û zêdetir jî berikên hevalê din bihingêve, lê bi şertê ku di navbera her du berikên hevalî de malikeka vala hebe.

Berik di nava malikên damê de dikarin sêalî herin û werin, lê bi paş ve nikarin bizivirin.

Damkirin: Ji **A** û ji **B**-ê, kîjanê ku berikeka xwe gihande rêza malikên ku navê wê *dam* e, ew berik dibe *dam* û dibêje "dam", herweha navê wê berikê bi xwe jî *dam* e. Îcar çi berika ku bibe dam, dikare bi yek carê di ser pir malikan re jî biqevêze, here-were, çaralî bigere û berikên hevalê din bihingêve, bi şertê ku malikên vala di navbera berikên hevalî de hebin.

Di leyztikê de yê ku zû dam dike, şansê qezenckirina wî zêde dibe. Ew berika ku bûye dam, yan libo libo berikên hevalê din dihingêve, yan her carê gelekan bi derbekê diginhêve. Kîjan hevalê ku berikên wî tev hatin hingavtin, leyztikê wenda dike. Yan jî eger berikek, diduyên wî bimînin, domandina li leyztikê jê re feydê nade.

Eger yekî berikên hevalê xwe hemû birin û tenê yek jê re hiştibe, ew berika mayî rasterast dibe *dam* û xwediyê wê pê dikare seredor li nava malikên damê bigere û berikên hevalê xwe bihingêve.

Institut kurde de Paris

# COLAN

*Colan* û *olan*, navên beza digel êk ji bo jihevderbaskirinê ne. Herweha jê re *cirîd* û *xaranî* jî têne gotin. Ev nav ji bezandina heywanên çarpê û herweha ji bo ya mirovan re jî têne gotin. Colan piranî bi hespan, bi keran, bi hêstiran û bi huşturan tê kirin.

Çaxê kirina colanê, bihar û payîz in. Çi bi siwarî û çi jî bi mirovan, her bi şird û hin caran jî bê şird çêdibin.

Li hin herêman ew colanên ku bi hespan têne kirin, weha ne: Kesên ku wê colan bikin, pêşî her yekê wan berxekê yan karikekê (kehr) tînin û li serê meydana colanê hazir dikirin.

Jixwe li piraniya herêman, ji bo colana hespan riyeka kifş bi qederê 5-10 km. dirêj heye.

Hin caran li dora 2O-3O siwarî kom dibin û ser û binê ebra xwe (dûr-nêz) kifş dikin. Siwar tev diçin devera kifşe û li wir dibin rêz, bi dana îşaretekê, ew hespên xwe dajon. Îcar kîjan siwarê ku pêşî bigîje devera kifşe, ew kar û berx tev jê re ne. Lê ji siwarê duyemîn û siyemîn re par tune.

**Texlîtên Colanê:**

**a)** *Colana Hespan:* Çewa ku me li jorê got, colana hespan ji du siwaran ta 15-20 siwaran çêdibe. Her siwarek pêşî şirdê xwe tîne datîne ba hekem û li hespê xwe siwar dibe, xwe ji colanê re hazir dike.

Institut kurde de Paris

Pêştre siwar hemû li devera kifşe rêz dibin. Hekem bi şeşagirê berikek diteqîne û siwar xwe hazir dikin, piştre hekem berika diduyan diteqîne û bi teqandina berika sisiyan re, siwar tev hespên xwe dajon.

Ji siwaran kîjanê ku pêşî digîje dawiya qadê devera kifşe, ew qezenc dike û şirdên ku hatine danîn tev jê re ne.

Hinek siwar di dema ajotinê de li hevûdu dek dikin. Heta hinek, hinekan terayî erdê jî dikin û hespên hevûdu vediciniqînin. Lê eger hekem pê bihise, wî siwarê dekvan tawanbar dike û destûra wî tune ku ew careke din têkeve colanê.

**b)** *Colana Keran:* Colana bi keran, bi her awayên xwe weke ya hespan tê kirin. Lê belê şirdên wê, tiştên piçûk in û qada wê jî kurt e. Şirdên ku têne danîn piranî dîk, mirîşk, şamî, qaz, werdek, çend lib hêk, kevok û gwd in.

**c)** *Colana Merivan:* Ji vê colanê re piranî *cirîd* û *bez* têne gotin. Ev jî mîna herdu colanên li jorê, bi şird û bê şird jî tê kirin. Du kes yan zêdetir, bi hevûdu re dibezin. Lê ji wan re riyeke kifş a taybetî nîne û qada rê jî kurt e.

Institut kurde de Paris

# BIRR

Ev leyztik menşûrê bi *leyztika feqiyan* e. Piranî li gundan tê bikaranîn, li bajaran nayê kirin. Ji bilî pîrek û keçan her kes pê dileyîze. Çi piçûk, çi mezin, çi maldar, çi jar, heta rîspîyên bavikan û serokên eşîran jî pê dileyîzin. Şêx, hecî û gelek kesên oldar jî xwe jê bêpar nahêlin.*

Ji bo leyztikê, bi hindikî divê şeş kes hebin. Ji pirbûna kesan re jî sînor tune.

Devera ku *Birr* lê tê leyîztin, rasteke mîna mexer e, yan mêrgek e. Li gundan piranî li şûna bênderan her tê kirin.

Devera Leyztinê: Di nêveka rasta ebra wê de kortikek bi qederê bihostekê kûr û bi qederê groveriya bêjingekê fireh heye û çend heb kevirên glomîtko tê de ne. Navê wî cihî *hoçk* e. Piştre navçe tê kifşkirin. Îcar kesên ku dileyîzin, dibin du ber. Ji bo destpêkirina leyztikê, herdu ber di nava xwe de pişk dikin. Bera kar dike, derdikeve û bera wenda dike jî hoçkê diparêze.

Bera parêzvanî, yekî ji xwe hildibijêre ku hoçkê biparêze. Navê yê ku tê hilbijartin *gavan* e. Lê li hin deveran jê re dibêjin *mîr*. Kar û îşê gava, tenê ew e

* Baweriyeke wilo jî di nava Kurdên oldar de heye, ku ango meriv bi leyztika birrê gunehên xwe diweşîne



Institut kurde de Paris

ku hoçkê biparêze, dà ku ji bera din kes nê û nigê xwe nexe kortika hoçkê.

Herweha yek ji bera êrîşvanî jî tê hilbijartin û navê wî *serok* e. Kesên di vê berê de, tev bi fermana serokê xwe dilipikin.

Kesên di bera êrîşvanî de gava dertên, hemû bi qederê 40-50 metreyî ji hoçkê dûr, li hawîdorê wê, groveriyeke mîna ya daîreyê dormedar gerr vedigirin û xwe nêzî hev dikin.

Îcar emê navê bera ku hoçkê diparêze deynin **A** û navê bera derketî jî deynin **B**. Mesela, bera **A**-yê hoçkê diparêze û bera **B**-ê jî derdikeve.

Her merivekî di bera **A**-yê de ku dileyîze, merivekî ji bera **B**-ê ji xwe re di çav radike. Yanî ew wî dike para xwe û dide serê, ewê di bera **B**-ê de jî ji berê direve. Eger **A** gihayê û tep (dest pê kir) lê xist, **B** pûç dibe û ji leyztikê dertê. Lê di wî çaxî de eger ji bera **B**-ê yekî din (kî dibe firq nake) di navbera wîyê **A** û hoçkê re derbas bibe, ewê ji bera **A**-yê diçe (pûç dibe) û ji leyztikê dertê. Herweha tepa kîjanê ji bera **A**-yê, li kîjanê ji bera **B**-ê bikeve jî, teplêketî pûç dibe û ji leyztikê dertê. Eynî wisan kîjanê ji bera **B**-ê, eger di navbera kîjanê ji bera **A**-yê û hoçkê re jî derbas bibe, ew (A) jî pûç dibe û ji leyztikê dertê. Kesê ku di leyztikê de pûç dibe, dûr diçe û li kena-

Institut kurde de Paris

rekî rûdine, li leyztikê temaşe dike, herweha nav li hevalên xwe dide û bevzê wan xweş dike, da ku bera wî qezenc bike.

Lê eger ji bera **B**-ê yekî firset dît û çû nigê xwe xist hoçkê, bê ku tep lê bikeve, leyztik kuta dibe û bera wî qezenc dike, qanekî davêje ser bera **A**-yê. Û bo leyztika cara diduyan jî, dîsanê bera **B**-ê dertê, bera **A**-yê her mîna berê disan hoçkê diparêze.

Lê eger bera **A**-yê, yeko yeko tep li kesên bera **B**-ê xistin û endamên wê tevek pûç kirin, ew çax bera êrîşvanî (B) dibe parêzvanê hoçkê, bera parêzvanî (A) jî dibe êrîşvanî û dertê.

Di daneserhevê de hin caran ji berekê pir kes diçin (pûç dibin) û ji berekê hindik kes diçin, yan jî hîç kes naçin. Mesela, eger ji bera **B**-ê merivek tenê bimîne, hevalên bera **A**-yê tev didin serê û ew (B) jî mefera xwe nabîne her bi çolê ve dibeze û ji ber wan direve diçe û her diçe.

Di leyztikê de eger ji bera **B**-ê merivek û ji bera **A**-yê çend meriv sax bimînin (pûç nebûbin), dîsan jî leyztik didomîne. Lê eger ji bera **A**-yê tenê gavan bimîne, endamên bera **B**-ê tev lê kom dibin, karin wî zû şaşo paşo bikin û yek nigê xwe têxe hoçkê, leyztikê di layê xwe de bi dawî bîne.

# SÊGAV

Leyztika *Sêgavê* sê cûreyên xwe hene: *Yekgav, Dugav* û *Sêgav*.

Di leyztika Sêgavê de, ber û hevaltî nînin. Her kes bi serê xwe ye û ji bo ceribandina birî û hêza xwe dileyîze. Leyztik bi du kesan û zêdetir, tê leyîztin.

Ev leyztik xasma di bihar û payizan de, piranî dema ku erd nerm be tê kirin.

Ji bo leyztikê, xetek bi berayî tê kişandin. Zilamekî rîspî jî dibe *kizîr*, da ku derbaskirina ji hev a kesên ku dileyizin bipîve. Ji bo avêtina gavan, gereke serê nig ji ser xeta kifşkirî bi aliyê ku xwe davêjin ve derbas nebe. Piştre dest pê tê kirin û bi hevûdu re dikevin pêşavêtinê.

Jihevderbaskirina gavan, bi şûna nigan a di erdê de kifş dibe û kes nikare hîlebazî jî bike. Di hersê cûreyan de jî, kî dûrtir gav avêtin, ew qezenc dike.

a) *Yekgav*: Ev leyztik du cûreyîn xwe hene.

1- Herdu nig bi hev ve, serê nigan li ser keviya xetê û xwe bi pêş ve hildiqevêze.

2- Meriv ji xetê, bi tersê devera gavavêtinê ve, dûr diçe û bi bez tê, dema ku giha ser xetê, serê pêçiyên

Institut kurde de Paris

Leyztika Sêgavê



Institut kurde de Paris

nigekî xwe datîne ser keviya xetê û heta ku biriya wî heye nigê din bi pêş ve davêje û xwe hildiqevêze.

**b)** *Dugav*: Meriv bi paş ve ji xetê dûr diçe û bi bez tê. Serê pêçiyên nigekî xwe datîne ser keviya xetê û nigê din bi pêş ve, du gavan davêje. Di avêtina gavê dawîn de herdu nig bi cotkî li erdê dikevin û disekine.

**c)** *Sêgav:* Ev cûre bi avêtina sê gavan e. Çewa li jorê jî hate gotin, dîsanê bi paş ve ji xetê dûr diçe û bi bez tê. Serê pêçiyên nigekî xwe -kevsa kîjan nigî xweş be- datîne ser keviya xetê û nigê din bi pêş ve, sê gavan davêje. Di avêtina gavê sisiyan de herdu nigên xwe bi cotkî li erdê dixe û disekine.

Piştî avêtina gavan a çend kesan, îcar kizîr tê û derbaskirina wan a ji hevûdu, dipîve. Kî ji wan zêde bihurandibe, ew qezend dike.

Institut kurde de Paris

# KEVIRÊ QEWETÊ

Ji vê leyztikê re çewa *Kevirê Qewetê* tê gotin, li hin deveran jê re *Kevirê Gûçê* jî tê gotin.

Di leyztikê de her kes bi serê xwe ye, heval û ber nînin.

Belam çewa ku ji navê leyztikê jî eşkere dibe, mirov pê biriya xwe dipîve. Piranî xort û zilamên ku ji nava xwe razî bin, pê dileyîzin.

Kevirê ku tê avêtin, bi raya kesên ku dê bileyizin tê niqandin. Piştre ebra avêtinê tê kifşkirin. Ji devera ku kevir lê davêjin re *hoçk* tê gotin.

Kesê ku kevir davêje, serê nigekî xwe datîne ber hoçkê û bi pêş ve heta ku jê tê davêje.

Kevirê qewetê du cure ne. Yek piçûk e û li dor 2-5 kêluyan heye, yek jî mezin e û li dora 2O -25 kêluyan heye.

Bi giştî heft cûreyên avêtina Kevirê Qewetê hene.

**1-** ***Avêtina Kevirê Piçûk:***

Pênc cûreyên avêtina Kevirê Piçûk hene:

**a)** Avêtina bi destan. Meriv li ser hoçkê disekine, serê nigekî xwe datîne ber hoçkê û nigekî jî bi paş ve dide. Çoka nigê li ser hoçkê hinekî bi pêş ve tê

Institut kurde de Paris

fisandin û nigê li paş jî, tevî çîpê tîk-rast dimîne. Kevir di destekî de ye û heta ku jê tê davêje.
Yê kevir davêje, keysa wî çewan xweş bê, du-sê caran milê xwe liba dike û kevir davêje.

b) Heliqandin: Kevir bi destekî meriv e, herdu nig cot in û meriv li ser hoçkê tîk-şipya disekine. Berî ku kevir bê heliqandin, destê ku kevir pê hatiye girtin du-sê caran bi pêş û paş ve dibe û tîne, hêj davêje.
Birin û hanîna destê ku kevir tê de ye, çewan ji meriv re xweş be, her wisan tê hejandin.

c) Paşavêtin: Meriv li ser hoçkê disekine, piştа xwe dide alîyê ku kevir pê ve tê avêtin û xwûzî erdê dibe, herdu nigan ji hevûdu fireh dike û bi herdu destan bi kevir digire. Piştre du-sê caran herdu mil û kevir bi pêş û paş ve dibe-tîne û hincirî di nava gavên xwe re davêje.

d) Avêtina Tewandi: Pêşiya meriv bi aliyê ku kevir pê ve tê avêtin ve ye. Meriv tewandî ye û bi herdu destan kevir bi pêş ve davêje.

e) Avêtina di navbera çîpanên xwe de: Meriv nîvçokdayî ditewe, herdu destên xwe ji paş ve di mabeyna çîpên xwe re derdixe, herdu çokên xwe hinekî bi pêş ve difisîne û kevir bi pêş ve davêje.

**2-** *Avêtina Kevirê Mezin:*

Du cûreyên avêtina Kevirê Mezin hene:

**a)** Kevir li ser kefa destê rastê ye, dest jî li ser girmilka rastê ye, enîşk hinekî bi pêş ve diçe, herdu nig jî cot li ser hoçkê dimînin û kevir tê avêtin.

**b)** Kevir li ser destekî (yê rastê) ye û dest ji tîra girmilkê bilindtir dibe. Nigek li ser hoçkê ye, yê din jî bi paş ve dirêj dibe û kevir tê avêtin.

*

Piştî kesên heyî tevan bi dorê ew kevir avêtin, îcar ji hoçkê hetanî şûna (dews) ku kevir li erdê ketiye bi nigan tê pîvandin. Jimara pîvana kî zêde be, ew qezenc dike. Kesên li dû wî duyemîn û sêyemîn e... Lê çaremîn û zêdetir nayêne hesibandin.

Institut kurde de Paris

# TEFŞ

Çewa ku navê vê leyztikê Tefş e, herweha navê kevirê ku pê tê leyîztin jî *Tefş* e.

*Tefş* kevirekî pahnî tenik e û mîna teyfikeke piçûk grover e. Ew goga ku pê tê leyîztin jî, kevirekî grover ê mîna hêkekê mezin e, yan piçûktir û mezintir e. Bi wî kevirê pahn (tefş) li wî kevirê grover (gog) dixin, dibin-tînin û pê dileyizin.

Bihindikî kesên ku dileyîzin, divê dido bin û her yekê wan tefşek heye. Lê belê gelek kes gava dibin du ber û dileyîzin, hê bêtir rewşa leyztikê xweş dibe.

Pênc cûreyên Leyztika Tefşê hene.

**a)** *Tefşa Sereka*: Li erdekî rast bi qederê dirêjiya ji 100 ta 200 metreyî ebreke berfireh tê kifşkirin. Li herdu seriyan, li dora 10-20 metreyî xetek bi berayî tê kişandin, yan jî du îşaret bi hewqas fireyî li pêşberî hev têne danîn.

Kesên dileyîzin dibin du ber. Herdu ber ji bo dabeşkirina herdu seriyan di nava xwe de pişk dikin.

Îcar em ê navê seriyekî qada leyztikê deynin **A** û navê seriyê din jî deynin **B**.

Berek **A**-yê diparêze û berek jî **B**-ê diparêze. Gog di

Institut kurde de Paris



Leyztika Tefşê

Institut kurde de Paris

nîvê ebra meydanê de, li devera ku ji herdu seriyan re nêvî ye tê danîn. Hevalên ku bera **A**-yê diparêzin, bi tefşên di destên xwe de hincirî li gogê dixin û wê digindirînin, dibin ku di serê **B**-ê re derxînin derve. Kesên ku bera **B**-ê jî diparêzin, ji anîna gogê re dibin asteng û bi tefşên xwe li gogê dixin, wê dibin ku di aliyê **A**-yê re derxînin derve. Herdu ber, her yekê wan hem aliyê xwe ji têrebihurandina gogê diparêze û hem jî gogê bi aliyê din ve dibe ku tê re derxîne derve.

Ji herdu beran kîjana ku gogê bir di aliyê bera din re derxist derve, qanekî dixe ser bera ku wî serî diparêze. Lê hin caran ji bedêla qanan ve li hev siwar dibin.

Institut kurde de Paris

Mesele: Bera **A**-yê, gogê bir di aliyê bera **B**-ê re derxist derve. Bera **A**-yê deh meriv in û bera **B**-ê jî deh in. Îcar her deh merivên bera **A**-yê ji devera ku gogê derxistine derve, li her deh merivên bera **B**-ê siwar dibin û tên li aliyê xwe peya dibin. Piştre îcar dest bi leyztika cara diduyan tê kirin.

**b)** *Tefşa Hoçkê:* Ev cûre leyztik jî herweha eynî weke ya pêşî, bi du kesan jî û bi du beran jî tê kirin. Tefş û gog eynî ne. Lê belê rewşa leyîztika vê cûreyê, ji ya pêşî cuda ye.

Li nîvê rastekê yan li bêndereke, kortikek tê çêkirin.

Navê wê *hoçk* e. Berek hoçkê diparêze û berek jî gogê tîne dixe hoçkê.

Li hawîdorê hoçkê bi groverî, ji hoçkê dûr bi qederê 5O-1OO metreyî, hawîdor û grover çixêzek tê kişandin, yan jî nîşan têne danîn.

Berî destpêkirinê, herdu kes an herdu ber di nava xwe de pişk dikin. Bera ku pişkê kar dike, bi tefşên xwe li gogê dixe û dibe ku têxe korta hoçkê. Bera ku wenda dike jî, hoçkê ji daxistina gogê diparêze.

Gog li devereka di nîvê hoçkê û wê çixêza dormedarkirî de datînin erdê. Hevalên bera êrîşvanî bi tefşên xwe li gogê dixin û wê dibin ku têxin hoçkê. Hevalên bera parêzvanî jî dibin asteng û nahêlin ku ew gogê bînin têxin hoçkê û bi tefşên xwe lê dixin, dibin ku ji çixêzê derbasî derve bikin.

Eger bera êrîşvanî gogê xist hoçkê, qanekî dixe ser bera parêzvanî û dora leytztika cara diduyan jê re ye. Na eger bera parêzvanî gogê ji xetê derbasî derve kir, qanekî dixe ser bera êrîşvanî û dora leyztika diduyan jê re ye.

**c)** *Tefşa Kulîkulî*: Ev cûra leyztik, bi her awayên xwe, mîna leyztika di "**a)**" û "**b**)"ê de tê kirin. Lê tiştê ji wan cuda ev e: Her kes li ser nigekî xwe diçe-tê û dileyîze. Yanî tev di meydana leyztikê de

kulîkulî digerin. Kesê ku herdu nigên xwe deyne erdê, ew ji leyztikê herac dibe. Lê gava li hevûdu siwar dibin, ewçax ne kulîkulî diçin.

**d)** *Tefşa Kortê*: Di erdê de kortek heye, navê wê *hoçk* e, li havîdor û ji keviyê bi qederê du bihostan dûr çixêzeke grover û bi qederê 2O-3O metreyî dûrtir jî çixêzeke din a grover tê çêkirin.

Du kes bi hevûdu re dileyizin. Yê ku di pişkê de kar dike, pêşî ew dest pê dike.

Tefşekî xwe yê tenikî piçûk datîne ser çixêza dûr û li ser nigekî (kulîkulî) bi tevşekî xwe yê din li wî tefşê piçûk dixe û tîné dixe hoçkê. Eger wî ew tefşik bê bela û siqûmat bir xiste korta hoçkê, qezenc dike û eger di nava wan de şirt hebe, distîne. Piştre dor dibe ya hevalê din. Lê eger nigê bilindkirî li erdê bikeve, yan gelşeke din peyda bibe, meriv dişewite û dor dibe ya hevalê din. Çaxê dor dibe ya hevalê din, ew jî her wisan dileyîze.

**e)** *Tefşa Siwarî*: Ev leyztik bi du û pir kesan tê leyîztin. Tefş û gog her mîna di wan cûreyên din de eyni tişt in.

Mesela, eger sê kes bileyîzin, em ê navê yekî deynin **A**, navê yekî deynin **B** û navê yê din jî deynin **C**.

Li rastekê kortek heye, navê wê *hoçk* e. Gog bi

qederê 2O-3O gavî ji hoçkê dûr li erdê tê danîn. Kesên ku dileyîzin, tefşên xwe ji ba gogê davêjin korta hoçkê. Tefşê kî bikevê, yan nêzîktirînê wê bibe, pêşî ew dileyîze.

Eger tefşê **A** bikeve hoçkê, yan nêzîktir bibe, dor dibe ya **A**-yê. Îcar **A** tefşê xwe ji ba korta hoçkê davêje gogê. Eger tefş lê ket û gog ji ciyê xwe ferqizî çû, heta devera ku lê disekine, **A** wê mesafê bi nigên xwe dipîve.

Di leyztikê de jimara kifşe 2O e. Eger gog bi qederê jimara 2O nigî ji şûna xwe çûbe, **A** wê leyztikê kar dike. Piştre **B** û **C** ji nû ve dê bi hev re bileyzin. Lê (mesela) eger jimara **A**-yê 12 nig bin, wê tefşê xwe ji devera ku tefş lê sekiniye bavêje tefşên **B** û yê **C** ku hêj di hoçkê de ne yan li nêzî wê ne. Eger li wan xist, du jimar jî ji wan distîne û dibe 14. Wê **A** dîsa tefşê xwe ji wir (devera lê sekiniye) bavêje gogê. Eger avêt û li gogê xist û 2O jimarên xwe temam kirin, qezenc dike û wê herdu hevalên din bi hev re ji nû ve bileyizin. Lê eger **A** tefşê xwe avête tefşên hevalên xwe û ew nehingavtin, dora avêtina gogê dibe ya kesê ku tefşê wî nêzîktirê hoçkê ye.

Bi vî awayê ku hate gotin, mesela eger **A**-yê 2O jimarên xwe temam kirin û piştre **B**-ê jî 20 jimarên xwe temam kirin, lê **C**-yê temam nekirine, ji **C**-yê re

Institut kurde de Paris

tê gotin: "Tefş bû dita te."

Îcar ji bo ku **C** xwe ji binê wî barî derxîne, weha tê leyîztin: Li keviya hoçkê kevirekî pahn datînin erdê û gogê jî datînin serê. **C** li pêşiya gogê xwar dibe û serê wî dikeve ser tîra hoçkê, piştre **A** li pişta **C**-yê siwar dibe û **C** bi tefşê xwe li gogê dixe û di nava gavê xwe re dibihurîne, gog diçe li deverekê disekine, tefşê xwe davêje gogê. Eger tefşê **A**-yê li gogê ket û gog ji şûna xwe çû, hevalê **B** diçe gogê tîne datîne ber **C**-yê û dîsanê **A** her li **C**-yê siwar e û **C** careke din li gogê dixe, piştre **A** dîsan ji ser pişta **C**-yê tefşê xwe davêje gogê. Lê eger **A**-yê tefşê xwe avêt gogê û lê nexist, îcar **B** li **A**-yê siwar dibe û her wisan didomîne...

Institut kurde de Paris

# KÊL

Navê vê leyztikê çewa *Kêl* tê gotin, herweha li hin deveran *Kêlevir* û *Qûç* jî têne gotin. Leyîztik bi du kesan û bi piran çêdibe.

Kesên ku dileyizin, an yeko yeko her kes bi şexsê xwe ye, yan jî pir kes dibine du ber. Ji pirbûna hevalên beran re jî sînor tune.

Çend cûreyên leyztikê yên cuda hene, lê tev dişûfine êkdu. Ew cûre, tenê bi jimara danîna pir û hindik a qûçan ji hev têne veqetandin. Yanî li herdu aliyên hoçkê qûçek, du qûç, sê qûç, çar qûç ta heft qûç jî têne danîn. Lê belê piranî sê qûç têne danîn.

Pêşî ebra leyztikê tê kifşkirin. Deverek dibe *hoçk*. Li du aliyan ji hoçkê dûr bi qederê 5-1O metreyan, (mesela) sê kevirên pehn ên bi qasê nîv metreyî dirêj têne çikandin. Yan sê kevirên yeklepî datînin ser hevûdu û sê qûç têne çêkirin. Fireyîya di navbera qûçan de, li dora 1-2 metreyan e.

Eger qûç pir bin, mesafeya di navbera wan de kurt çêdibe. Lê eger qûç hindik bin, mesafeya di navbera wan de jî dirêj çêdibe. Eger li her aliyekî tenê qûçek hebe, ew qûç ji hoçkê gelekî dûr têne danîn. Herdu rêzên qûçan û hoçk, dibin mîna tîreke rast û li êkdu dinerin.

Institut kurde de Paris


Leyzîka Kelê

Kesên ku dileyizin, eger dido bin, her yekê wan ji xwe re sê heb kevirên yeklepî hazir dike. Eger du ber bin û her berek pir kes bin, her yekê wan tenê kevirekî yeklepî ji xwe re hazir dike. Ew, bi kevirên xwe digirin û tên li ber hoçkê disekinin.

Piştre herdu kes an herdu ber, ji bo destpêkirina leyztikê û ji bo parvekirina herdû rêzên qûçan, di navbera xwe de pişk dikin. Bera yan kesê ku kar dike, aliyekî qûçan ji xwe re kifş dike û kevirên di destên xwe de davêjin qûçên bera din.

Emê bêjin navê berekê **A** ye û navê bera din jî **B** ye. Herdu aliyên rêzên qûçan jî bi **1** û **2** kifşkirî ne. Mesela, di pişkê de rêza qûçên bi nimra **1**, para bera **A**-yê ketiye û ji bo destpêkirinê jî **A**-yê kar kiriye. Rêza qûçên bi nimra **2** jî, para bera **B**-ê ketiye.

Mesela, (em ê bêjin ku) bera **A**-yê çar kes in. Ew bi dor, kevirên di destên xwe de davêjin. Pêşî, yê ku davêje, nigekî xwe datîne ber hoçkê, nigekî jî bi şûnde dibe û kevirê di destê xwe de davêje qûçên bera **B**-ê. Hedefa kevirê avêtinê çi qûça pêş, çi qûçên din, firq tune. Piştî wî, hevalekî din û yekî din heta ku tev kevirên di destên xwe de avêtin qûçên bera **B**-ê. Eger wan qûçên **B**-ê hemû terakirin, li gorî jimara qûçên terakirî qan dixine ser bera **B**-ê.

Ji bo leyztikeke din, hevalên bera **B**-ê disa qûçên

Institut kurde de Paris
INSTITUT KURDE de PARIS · BIBLIOTHEQUE

xwe rast dikin û hevalên bera **A**-yê dîsa kevirên di destên xwe de davêjin quçên wan. Na eger **A** qûçên **B**-ê teranekiribin, yan hinekî terakiribin, bera **B** li gor jimara qûçên xwe yên terabûyî qan dixwo. Îcar dora avêtinê dibe ya bera **B**-ê.

Bera **B** jî, çewa ku di bera **A**-yê de hate gotin, kevirên di destên xwe de davêjin qûçên bera **A**-yê. Eger bera **B**-ê çend qûçên bera **A**-yê terabikin, qanên **A**-yê ji ser xwe hiltînin. Li wê gorê bi jimara terakirina qûçan, herdu ber, an herdu kes qan li hevûdu kêm û zêde dikin.

Mesela, eger bera **B**-ê sê qûçên bera **A**-yê terakiribe, herdu qanên bera **A**-yê ji ser xwe radike û qanekî zêde jî dixe ser bera **A**-yê. Û ji bo leyztikeke din jî, dor ya bera **B**-ê ye.

Institut kurde de Paris

# MEHKEME

Ev leyztik, menşûrê bi ya feqiyan e. Lê hin caran xort û zilamên mezin jî pê dileyîzin. Bi piranî di hindurûyekî mezin de tê kirin.

Leyztika Mehkemeyê, weha çêdibe: Yek dibe *mîr*, yek dibe *kizîr*, yek dibe *katib* (nivîsende), du kes dibin *serbaz*, hin kes jî dibin *tawanbar*. Yên tawanbar tev derdikevin derve û yên berpirsyar li hindurû ciyê dadgehê hazir dikin. Xasma li mizgeftê yan li medresê, di xaniyekî fireh de perdeyeke bi qederê metreyekê fireh seranser tîk vedigirin û li binê wê merşikeke berteng radixînin. Ew merşik, ji aliyê derî ve bi qederê gavekî ji perdê bi pêş ve dimîne. Mîr li pişta perdê şipya sekiniye û ew merşika raxistî di nava gavên wî re bihuriye. Li paş mîr du serbaz rûniştî ne û her yekê wan rahiştiye guşekî merşikê. Kizîr li pêşiya perdê ji aliyê derî ve, û li kêleka wê merşika raxistî li ser kursiyekî rûdine. Berdevkê dadgehê jî li ber derî disekine û lîsteya navan dixwîne. Gava wî navê kî xwend, ew kes ji derve tê hindur û diçe ser merşika raxistî li pêşberê mîr disekine. Mîr wî kesî bi kirina îşên xirab tawanbar dike. Kizîr jî bersîva tawanbarî dinivîse. Lê her ku diçe, mîr tiştên giran dixe situyê tawanbarî. Tawanbar jî hîç li xwe mikur nayê û xwe diparêze.

Institut kurde de Paris

Di dawî de mîr qîreke berz didê. Ew qêrîn ji serbazan re îşaret e û herdu serbaz wê merşika di binê nigên tawanbarî de hincirî dikşînin û tawanbar serpişt dikeve erdê. Kizîr tawanbarî ji erdê radike û wî dibe li deverekê dide rûniştandin. Îcar berdevk bangê tawanbarekî dinê dike û her wisan leyztik tê domandin...

Kesê tawanbar eger hinekî sil bin û hay ji xwe bimînin, bi kişandina merşika di binê nigên xwe re, xwe bi jor ve dihilavêjin û merşik li valayiyê diçe. Ewçax îcar herdu serbaz serpişto li erdê dikevin.

Institut kurde de Paris

# GOG

Du cureyên vê leyztikê hene: *Goga Peya* û *Goga Siwara*.

a) *Goga peya*, bi gogê û dar tê leyîztin. Navê darê ku gog pê tê leyîztin *Kaşû* ye.

Goga Peya, ji pirça dewaran tê çêkirin. Bi mezinatîya xwe mîna hêka kewê, heta bi mezinatîya mîna hêka mirîşkê, mîna hêka qazê û ya şamiyê cuda cuda tîpên xwe hene.

**Çêkirina gogê:**
Pirça dewêr ya nermik di nava herdu destan de tê lûfandin û bi ser hevûdu ve didewisînin. Çaxê weke xarekê mezin bû, êvarekê dixine nava avê, da ku bişide û hişk bibe. Piştî rojekê disan pirç lê tê letandin û disan jî dixine nava avê hetanî sibehê dihêlin. Bi wî hawayî, li çêkirinê tê domandin, heta ku temam dibe.
Îcar mezinayî û piçûkayîya gogê, her li gorî daxwaza meriv tê çêkirin.

*Kaşû:* Bi qederê pênc-şeş bihostan dirêj e. Qalindiya wî, normal e. Topika seriyê pêgirtinê bi qederê neynûkekê ji gewde qalindtir e û keviya topikê mîna hêşiya kujînekê hinekî zêde ye. Di bin hêşîyê de qulek heye û tê re benikek derbaskirî ye, bi

Institut kurde de Paris

qederê ku destek tê re biçe xilpoqa wî fire ye. Dema leyztikê, dest dikeve wê xulpoqê. Serê kaşû yê jêrê hinekî pahn e û çokdayî ye û bi qederê 150-160° vekirî ye.

Devera Leyztik, rastek e û di nîvê wê rastê de kortikek heye, navê wê *hoçk* e. Di wê rastê de jî groverîyeka mezin î fireh li hawîdorê hoçkê, yan bi îşaretan yan jî bi xazekê tê çêkirin.

Ji bo destpêkirina leyztikê: Yan bi avêtina niftikê bi hatina *mîr* û *kizîn - sofî* û *diz*, yan bi avêtina kapekî, yan bi avêtina pere wek *yazî* û *tûre*, yan jî bi *derîradan*ê dest pê tê kirin.

Derîradan jî weha ye: Du meriv bi qederê 5-7 metreyan ji hev dûr dibin û bi nigên xwe erdê dipîvin ber bi hev ve diçin. Yek dibêje "bizdidm" û nigekî xwe davêje pêşiya nigê din, hevalê din jî dibêje "badidim" û her wisan dike, herdu ber bi hev diçin heta ku nigê yekî giha ser nigê yê din. Îcar ewê nigê wî dikeve ser nigê yê din, dibêje "Derî li te radidim" û bera wî qezenc dike. Navê vê bera ku qezenc kiriye dibe *bera derketî*.

Hevalên bera ku wenda didke û ku ew dê hoçkê biparêzin, di nava xwe de yekî hildibijêrin. Jê re *mak* yan *gavan* tê gotin. Karê gavan her parastina hoçkê ye û hîç jê dûr nabe.



Institut Kurde de Paris

Gog, li ser xaza li hawîdorê hoçkê tê danîn. Hevalên bera derketî bi kaşuyan li gogê dixin, wê tînin ku têxin hoçkê. Hevalên bera hoçkparêz jî nahêlin ku ew gogê bînin têxin hoçkê û bi kaşuyên xwe ligogê dixin, dixwazin ku wê bibin ji xazê derbasî aliyê derve bikin.

Eger bera ku qezenc kiriye gogê anî xist hoçkê, qanekî dixe ser bera hoçkparêz. Lê bera hoçparêz eger ku gogê bir ji xazê derbasî aliyê derve kir, qanekî dixe ser bera din û dertê. Leyztik her wisan bi qezenckirin û wendakirinê, derketin parastina hoçkê tê guhartin.

Leyztikvanî hin caran ji bedêla her qanekî ve, hêkekê jî didine hevûdu.

**b)** *Goga Siwara*: Pir kes li hespên xwe siwar dibin û kaşû di destên wan de ne. Ev leyztik jî du cûre ne.

**1-** Ev, bi her awayên xwe mînaye leyztika *Goga Peya*; bi eynî gog û kaşûyan tê leyîztin. Lê di vê leyztikê de gog mezin e û kaşû jî dirêj in.

**2-** Çewa ku di leyztika *Goga Peya* de çêdibe, siwar dibin du ber û ji bo destpêkirinê di nava xwe de pişk dikin.

Institut kurde de Paris

Devera leyztikê: Rasteke dirê e. Li herdu serîyan bi qederê 15-20 metreyî ji hev dûr, du îşaret hene. Li herdu seriyên meydanê, her yekê siwarek sekinî ye û aliyê xwe diparêze. Gog li nîvê meydanê, bi dûrîya weke hev a ji herdu seriyan tê danîn.

Her berek dixwaze gogê bibe di aliyê serê bera din re derxîne derve. Îcar kîjan bera ku gogê bibe di navbera herdu îşaretan re derbasî derve bike, ew ber qezenc dike.

Institut kurde de Paris

# ROVÎ-ROVÎ

Ev leyztika kêf û şadkirinê, li gelek hermên Kurdistanê tê bikaranîn. Zilamên mezin, xort xasma di rojên dawet, şahî û kirîvatiyan de pê dileyizin.

Belam li gelek gundan hin kesên henekvanî û lêpok hene ku bi pîşeya xwe navûdeng dane. Dema ew di rojên dawet, kirîvatî û şahiyan de têne ba hev, hin reqs û leyztikên ku tenê xasmetiya bi wan ve ye dikin. Ew, bi wan leyztikan hostatîya xwe ya taybetî nîşanî xelkê didin û reqs û govendên pirtexlît dikin. Ha yek ji wan layztikan jî ya *Rovîrovî* ye.

Destpêkirina Leyztikê: Gelek mirov bi pişta hev digirin û li pey hevûdu kaşerêz dibin. Yê li dawî, xwe dixe şûfê rovîyan û şiveke ter di destan de ye. Ew, yekcaran şiva xwe mîna ristika teşiyê her carê qasekî bi ranê xwe ve dilûfîne û ji nedî ve li rast û çep dadiweşîne, li kesên di dûvik de dixe, pê re jî bi dengekî bilind stiran, dîlok û metelokên di derbarê diziya mirîşkan de ku li ser rovîyan hatine gotin, dibêje.

Kesên di dûvik de ne, tev xwe digel êk, li gorî nikla dengê stiranê dilivînin; weke roviyan fetl û çiv didin xwe û direqisin

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

# ÇALIK

*Çalik* an jî *kortik*, bi qederê cîgirtina hêkekê fire û kûr e. Hawîdorê wê meydaneke rast î pahn e. Ji çalikê dûr bi qederê du-sê metreyan li hawîdor çixêzek tê çêkirin. Kesên ku dileyizin, xarên xwe datînin ser çixêzê û bi tiliyekê fîtok lê dixin da here têkeve wê çalikê.

Avêtina xarê: Tiliya eşedê datînin ser ya navîn hişk dişidînin û berdidin ku hincirî li xarê bikeve. Xar ji ber zirpa wê digindire û diçe dikeve kortê, yan jî nakevê.

Eger pir kes xarên xwe bavêjin û xarên wan nekevin çalikê, lê eger xarek tenê bikevê, ew xarên neketinê hemû ji xwediyê xara ku ketiyê re ne. Lê eger du-sê xar ketibinê, vêca ew xarên din ku neketinê li şûna xwe dimînin û xwedîyên van xarên ku ketinê, ji nûve dîsa xarên xwe davêjin çalikê.

Leyztik wisan didomîne, heta ku tenê xarek bikeve çalikê. Di dawî de kîjan xar ku di çalikê de tenê bimîne, ew xarên li derve hemû ji xwediyê wê re ne.

Institut kurde de Paris

# GIRRÊ DEVEHAN

Ev leyztik piranî ji bo ceribandin û bihêzbûna mirovan tê bikaranîn. Bi vê leyztikê çi zarûk, çi xort û çi jî zilam, her kes pê dileyîze û biriya xwe li hevûdin diceribîne.

Du kes dikevine ser çapelûkan û paşiya xwe didie hev. Stûyê herduyan her yekê bi serê benekî qalind ve, yan tiştekî mîna werîs, kindîr û hwd têne girêdan. Piştre ew zorî didine hevûdu û her yekê wan bi pêş ve diçe. Bi wî hawayî yek yekî li dû xwe kaş dike. Îcar yê kêmbirî kîjan be, li pey yê hêzdar dikişe.

Institut kurde de Paris

# DARÊ GÛCÊ *

Ev leyztik sihêtî û ceribandina birî û bihêzbûna du kesan diyar dike, ka ji wan kî bi hêz e û kî jar e. Piranî kesên xort û zilamên ku ji nava xwe razî bin, bi Leyztika *Darê Gûcê* dileyîzin.

Du kes li erdê rûdinin, çîpên xwe dirêj dikin, rûyên binê nigên xwe didine hev û darekî dixin nava destên xwe. Destê yekî li aliyekî serê dar e û li aliyê din jî destê yekî li aliyê serê din ê dar e. Piştre her yekê wan dar bi ser xwe ve dikişîne. Îcar ji herduyan kî zêde bi hêz be, yê din radike hewa û bi ser xwe ve dixîne. **

* Di kurdî de hevmaneya "gûce"ya farisî, "canrik" e. Bêjeya "gûçah" navê *devera ne kûr e* û bêjeya "gûçî" jî navê devera kûr e.

** Ev leyztik di nav xelkê de bi *hatina çaxê jinanîna xortan* menşûr e. Dema xortek bi darê gûcê yekî din radike hewa, êdî bavê viyê bi hêz ango çavên xwe jê re li keçekê digere.

Institut kurde de Paris

# NAVEROK

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHEQUE

**Leyztikên Zarûkan**
**Beş - I**

Heftok .................................................... 11
Çavgirtîk .................................................... 14
Berde-Berde .................................................... 15
Jijû .................................................... 16
Moza Dewaran .................................................... 18
Siwar-Siwar .................................................... 19
Tilîpindik .................................................... 20
Mak .................................................... 21
Kerik .................................................... 22
Morîk .................................................... 24
Pezkoguro .................................................... 25
Pirsemal .................................................... 29
Agirxwestin .................................................... 30
Stêr .................................................... 32
Zirnezîq .................................................... 34
Firî-Firî .................................................... 36
Çaqoberk .................................................... 38
Potepêç .................................................... 40
Darqîtik .................................................... 41
Tep .................................................... 44
Hoto-Moto .................................................... 47
Zîç .................................................... 48
Tîr û Kevan .................................................... 50

Institut kurde de Paris

Xar û Kap ........................................................ 51
Mîr û Kizîr ........................................................ 56
Vizik ........................................................ 58
Gustîl ........................................................ 61
Fîncan ........................................................ 64
Mamê Lûs ........................................................ 65
Sêrmûsê ........................................................ 68
Hêk ........................................................ 72
Meşka Dimsê ........................................................ 75

**Leyztikên Mezinan**
**Beş - II**

Sêberk ........................................................ 79
Nehberk ........................................................ 81
Dam ........................................................ 82
Colan ........................................................ 85
Birr ........................................................ 87
Sêgav ........................................................ 90
Kevirê Qewetê ........................................................ 93
Tefş ........................................................ 96
Kêl ........................................................ 103
Mehkeme ........................................................ 107
Gog ........................................................ 109
Rovî-Rovî ........................................................ 113
Çalik ........................................................ 114
Girrê Devehan ........................................................ 115
Darê Gûcê ........................................................ 116


Institut kurde de Paris

## Pirtûkên Çapbûyî:



1) Xwençe Cild I, 2) Xwençe Cild II, 3) Xwençe Cild III, 4) Xwençe Cild IV, 5) Xwençe Cild V, 6) Xwençe Cild VI, 7) Xwençe Cild VII, 8) Nimûne Ji Gencîneya Çanda Qedexekirî, 9) Işkencede 178 Gün, 10) Siyabend û Xecê, 11) Xwendina Medresê, 12) Kadîna Mişkan, 13) Balafira Jînê, 14) Xweşber.

**Pirtûkên klasîk ên wergera ji tîpên erebî bi tîpên latênî û çapbûyî:**



Institut kurde de Paris

**1)** Dîwana Melayê Cizîrî, **2)** Nûbihara Ehmedê Xanî, **3)** Mewlûda Kurmancî ya Melê Bateyî, **4)** Şerha Eqîdeya Ehmedê Xanî ya Mele Ehmedê Qoxî, **5)** Sirmehşera Feqe Reşîdê Hekarî, **6)** Nehc-ul Enama Mele Xelîlê Sêrtî, **7)** Dîwana Pertew Begê Hekarî, **8)** Rewdneîma Şêx Evdirehmanê Axtepî, **9)** Dîwana Şêx Evdirehmanê Axtepî, **10)** Mîrsad-ul Etfala Şêx Mihemed Kerbela, **11)** Iqdê Durfama Şêx Eskerî, **12)** Herdubat, Mewlûda Mele Zahidê Diyarbekrî, **13)** Leyl û Mecnûna Şêx Mihemed Can.

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

PENCÎNAR
ISBN 91 972090 5 8

K.L.